

✓ PDK'ê hevalben-  
diya bi dijmin re  
tercîh kir

✓ Gelê kurd îxanet  
baş nas kir

✓ Dewletên herêmê  
çareseriyê dixwazin

✓ Şoreşa Bakur û  
Başûr bû yek

Rûpel 3

Endamê Komîteya Rêveber a PKDW'ê Remzî Kartal:

## Wê 1998 bibe sala yekîtiya neteweyî

Hevpeyvîn bi D. Ebdulfettah re:

Divê em toza li ser  
zimanê kurdî daweşînin

R. 8-9

Dîrok:

Mirov bi xweziyê  
nagihê keziyê


R. 4

Azad Şîrîn:

Jiyaneke mezin,  
Bermal

R. 6



Azadiya **WELAT**

SAMİ TAN

## Zilm û zor ji bo dewletê pêdivî ye

**H**efteya çûyî, ji aliyê bûyeran ve hefteyeke têr tijî bû. Di 5'ê mehê de Şahiya Piştgiriyê ya Azadiya Welat pêk hat. Bi qasî 3-4 hezar kesî piştewaniya xwe ji rojnameyê re diyar kir. Tiştê ku bal kişand, kesên ku axaftin kirin, ji bo ku rojname têrî daxwazê nayê firotin, xwe rexne kirin. Digel hestên piştgiriyê, helwesta xêmxwazan jî di şevê de diyar bû, nêzî 300 heb rojnameyên me hatin desteser kirin.

\*\*\*

Her wekî tê zanîn 10 berfanbarê "Roja mafên mirovan" e, rayedarên dewletê di rojên wisa de pesnê xwe û dewleta xwe didin. Lê dinya giş êdî bi rewşa dewleta tirk dizane, di raporên navneteweyî de ev rastî bi awayekî zelal li ber çavan tê raxistin. Bo nimûne di Rapora 1997'an a Rêxistina Navneteweyî ya Lêborînê de, li ser Tirkiyeyê wiha tê gotin: "Bi sedan kes ji ber bîr û ramanên xwe hatine girtin. Şkence bi awayekî sistematîk didome, wekî encama

şkenceyan bi kêmanî 25 kes di bin çav de hatine kuştin; 23 kes di binçav de hatine windakirin. Piraniya wan ji herêma kurdan, birek mirov jî bi destê hêzên dewletê hatine kuştin."

Her çiqas çapemeniya tirk dev ji derew û propagandayê bernade jî, sazîyên navneteweyî bi rastiya gelek bûyeran dizanin. Wekî mînak, di heman raporê de tê daxuyandin ku tevkujiya gundê Basayê (Güçlükonak) ji aliyê hêzên dewletê ve ji bo têkbirina agirbesta yekalî ya PKK'ê hatiye kirin.

Dewlet li derve ketiye nava tengasiyê mezî, dozên ku di Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê de li dijî Tirkiyeyê hatine vekirin, yek bi yek bi biryarên li dijî Tirkiyeyê sergîhayî dibin, lê dewleta tirk dev ji kirinên xwe yê berê bernade. Lewre dewlet ancaz dikare bi tevkuji û êrîşên wiha rê li ber serhildanên mezî bigire. Diyar e ku ew tişt jî demeke dirêj nikarin rê li ber serhildanên gelêrî bigirin. Jixwe gelek nivîskar û şewirkarên dewletê jî ve yekê

dibînin û çareseriyê li gorî berjewendiyên rejîmê dixwazin.

Her wekî me li jor jî da xuya kirin, pêdiviya dewletê bi zilm û zorê heye, lewre nikare dev jê berde. Li hemberî ve yekê êrîşê dibe ser sazîyên ku li dijî wan kirinan derdikevin û dengê gel digihînin cihanê. Pêşî şaxên ÎHD'yê yê li Kurdistanê yek bi yek hatin girtin, pişt re jî berê xwe dan NÇM'ê, niha jî berê xwe dane çapemeniya dijber.

Ev demeke dirêj e ku nahêlin rojnameyên Ûlkede Gündem û Emek bikevin Kurdistanê. Tevî hemû hewl û serlêdanên berpîrsên her du rojnameyan jî, kes li ve kirinê xwedî dernediket, xuya bû ku berpîrsê ve qedexeyê rayedarên rastîn ên dewletê bûn. Lê hefteya çûyî ev êrîşa "kiryar nediyar", bi biryareke fermî bû êrîşeke kiryar diyar. Li hemberî ve yekê bêdengî nayê pejirandin. Azadiya Welat jî parçeyekî çapemeniya azad e. Ji ber ve yekê jî em ve êrîşê bi tundî şermezar dikin û di vî warî de çî bikeve ser milê me, em jê re amade ne.

Pêdiviya dewletê bi zilm û zorê heye, lewre nikare dev jê berde. Li hemberî ve yekê êrîşê dibe ser sazîyên ku li dijî wan kirinan derdikevin û dengê gel digihînin cihanê.

## Divê mirov çewt rûne, rast biaxive

## Ferahengok

<b>akam:</b> encam, netîce	sa neynûkan
<b>beramber:</b> li hemberî hev (karşılık)	<b>mozil:</b> cureyekî elegê
<b>berfende:</b> aşî (çığ)	<b>naznav:</b> laqab
<b>bêje:</b> peyv (kelime)	<b>nepenî:</b> veşarî (gizli)
<b>bîrdoz:</b> îdeolojî	<b>nijmandin:</b> lodkirin (istif etmek)
<b>bîna:</b> mîna (gibi)	<b>nîgarkirin:</b> xêzkirin
<b>çelîkirin:</b> qalkirin	<b>nola:</b> mîna (gibi)
<b>darîştin:</b> afirandin (türetmek)	<b>palandin:</b> pârzandin (süzmek)
<b>derûnî:</b> ruhî (psikolojik)	<b>peywir:</b> vatînî (görev)
<b>diwaroj:</b> pêşeroj	<b>pêdivî:</b> pêwîst (gerekli)
<b>dîr:</b> din (diğeri)	<b>pêşdarazî:</b> önyargı
<b>ezmûn:</b> tecrûbe	<b>pirêze:</b> pratik
<b>êsta:</b> niha (şimdi)	<b>qelax:</b> sergîn (tezek)
<b>fêrgeh:</b> dibistan (okul)	<b>raborî:</b> rabûrdû (mazi)
<b>fîrmêsk:</b> hêstir, rondik	<b>raz:</b> sir
<b>gencîne:</b> xezîne	<b>rawe:</b> kîp
<b>gengêşt:</b> nîqaş (tartışma)	<b>rêbaz:</b> azîne (metod)
<b>hêman:</b> ûnsur (eleman)	<b>rêpavan:</b> meşîn
<b>hind:</b> cem	<b>rûdan:</b> bûyer (olay)
<b>ji bîlî:</b> ji weynî	<b>sazbûn:</b> avabûn
<b>ji meş ve:</b> ji berê ve	<b>şîwan:</b> şemsiye
<b>jiwan:</b> randevû	<b>stewîn:</b> kemilîn
<b>jingeh:</b> hawirdor	<b>şêr:</b> dîn (deli)
<b>kat:</b> dem (zaman)	<b>şîpên qeşayê:</b> sulav (hızlı su akıntısı)
<b>kişik:</b> strenc	<b>tevlî:</b> têkilîhev (ilişkili)
<b>komelayetî:</b> civakî	<b>têbînî:</b> nîşe (not)
<b>komelkuji:</b> tevkuji (soykırım)	<b>teşe:</b> awa (şekil)
<b>lay:</b> alî, hêl	<b>vebir:</b> teqez (mutlak)
<b>leç:</b> tûre	<b>wejartin:</b> hilçînîn (ayıklama)
<b>lêker:</b> fiil	<b>werzîs:</b> spor
<b>mişt:</b> tijî (dolu)	<b>xepirandin:</b> çapalamak
<b>miçînka neynûka:</b> meqê-	

## BEDRAN BÊNAV

**D**i 30'ê sermaweza 1997'an de di MED-TV'yê de bernameyek bi navê "Dîalog" hate weşandin. Di ve bernameyê de Sekreterê Giştî yê PSK'ê Kemal Burkay rewşa siyasî ya bakurê Kurdistanê nirxand. Ez gelek spasiyên xwe ji amadekarên ve bernameyê re dikim. Bernameyên bi vî rengî di MED-TV'yê de hîn zêdetir çêbibin wê gelek çêtir be. Ji ber ku gelê me, wê bi vî awayî siyasatvanên kurd ji nêz ve û baştir binase.

Hîn di seriya bernameyê de Birêz Burkay digot: "Beriya 12'ê rezberê faşistekî jî nikaribû biketa nav xaka Kurdistanê...." Di gotina wî de ev dihat fêmkirin ku beriya 12'ê rezberê rewşa siyasî ji niha baştir bûye û wan gel hişyar kiribûye, lê ji ber destpêkirina şerê çekdarî faşist îro ketine Kurdistanê.

Birêz Burkay, faşist û dagirker ev serê hezar salan e ku ketine nav xaka Kurdistanê. Alên wan li nav tevayî bajar, navçe û gundên me ev serê çend sed salan e ku li ba dibin û reperepa potînen wan li ser dil û mêjiyê me ye.

Hûn dibêjin: "Me di 1974'an de nehişt ku Türkêş têkeve Amedê." Gelo we nehiştibû? Wê demê partiya

we hîn nedihat naskirin. Ger Türkêş neketibe Amedê ev yek ne bi saya we bû. Wê rojê bi sedan xortên kurdan ên xwendevanên zanîngihan û gelê Amedê li ber xwe da. Di kolanên Amedê de wê rojê li ber tankên dagirkeran çend xortên kurdan şehîd ketin? Di nav wan de, jî rêxistina we çend kes hebûn? Me ji Amedê bera wî da û reviya çû Rihayê. Wê rojê we di nûçeyên TV'yê de temaşe ne-

Faşîst duh jî û îro jî li ser xaka me ne. Lê îro, li dijî wê berxwedaneke xurt heye. Berî 12'yê rezberê li Anatoliyê rêxistinên gelek bihêz hebûn lê ji ber ku rêberiya wan di xeta reformîst de bûn, bi ser neketin.

kiribû ku Türkêş li Rihayê tapûyên erdan li gundiyan belav dikirin û gundiyan kurdan jî destên wî maç dikir? Ma Riha ne xaka Kurdistanê ye? Erê birêz Burkay. Hûn van tev dizanin. Lê ez nizanîm(!) çima hûn ve rastiye nabêjin? Heke armanca we ewe ku hûn li pey pirêzeya (pratîka) PKK'ê qehremaniya vala bikin, ev yek naçe serî.

Ger partiyek li gorî rastiya civaka xwe, li gorî pêşveçûnên civakî li dijî politikayên împeryalist û dagirkeran xwe neguherîne, li ser rêça kevnare bimîne, ne dikare bi pêş ve here, û ne jî gel bawerîya xwe bi wê tîne.

Ka em hinekî jî li ser xebatên we rawestin. We carinan digot, "Kurdistan nîv-feodal, we carinan digot, "Na tam kapitalist e." Hîn çaran jî we rasterast êrîşî bir û baweriyên gel dikir. Tevgera Azadiyê demeke dirêj ji bo ku bandora neyinî ya xebat we ji holê rake, ked da.

Wekî hûn jî dizanin li ser gelê kurd du cure komelkuji hene; yek komelkujiya fizîkî û ya duyemîn jî komelkujiya spî ye. Heke em li gorî siyaseta we bimeşin, emê li ber komelkujiya spî biqedin.

Birêz Burkay faşist pêr jî, duh jî û îro jî li ser xaka me ne. Lê îro, li dijî faşizmê û dagirkeriyê berxwedanek xurt û mezin tê dayîn.

Berî 12'yê rezberê li Anatoliyê rêxistinên çîna karkeran ên gelek bihêz hebûn û şertên şoreşê jî gelek gihastî bûn. Gelo çima pêşveçûn an şoreşek çênebû? Digel ew qas mercên objektîv û subjektîv tevayî mewzî belaweke bûn. Ji ber ku rêberiya wan û serokatiya wan di xeta reformîst de bûn.

Ka hela em qet jî li dîr nenihêrin, ji nêz ve li dîroka Osmanîyan binihêrin ku hûn xweş pê dizanin. Osmanîyan mafê tu gelî ji ber xwe ve dabûn wan û mafên wan naskiribûn? Gelo qet hatiye bihîstin ku kesî ji ber xwe ve mafê tu kesî daye? Qey hûn li hêviya neviyên Osmanîyan in ku belkî mafê gelê me ji ber xwe ve bidin?



Endamê Komîteya Rêveber a PKDW'ê Remzi Kartal:

# Wê 1998 bibe sala yekîtiya neteweyî



Remzi Kartal

ARGK'ê di sala 1997'an ji aliyê leşkerî ve serkeftineke zor baş bi dest xist, ji layanî îxanetê ve îxanetkarên kurd di nav milletê kurd zor zor baş hatin naskirin, ji layanî dîplomasiyê ve serkeftineke pir hêja hate bidestxistin. Wê sala 1998'an jî ji bo yekîtiya û netewebûna kurdan zor baş û girîng be.



Aydar

Di 4'ê wê mehê de li Silêmaniyê ji bo amadekariya Kongreya Neteweyî bi beşdariya 16 rêxistinên kurd û bi sedan rewşenbîr û hunermendî konferanseke amadekariyê hate lidarxistin. Ev konferans wekî berhema xebatên PKDW'ê tê binavkirin. Ev xebat berê ji aliyê Endamê Komîteya Rêveber a PKDW'ê Zübeyir Aydar ve dihate meşandin.

Dema ku xebatên Endamê Komîteya Rêveber a PKDW'ê Zübeyir Aydar li Başûr didomiyên, li Enqereyê jî civînên PDK-YNK û dewleta tirk qaşo ji bo aştiya di navbera her du hêzan de hebûn. Li ser xebatên ku heta niha hatine kirin û ên ku wê di pêşerojê de bînin kirin, Zübeyir Aydar agahî dane me.

Aydar dide zanîn ku wê demê jî bi awayekî erênî li civîneke Kongreyê Neteweyî hatiye nihêrtin. Lê di wê demê de pêvajoya Enqereyê hebûye, di wê pêvajoyê de PDK'ê daxwazên dewleta tirk peşandine. Ev helwest li ber Kongreya Neteweyî bûye asteng. Her wiha Aydar li ser pêvajoya Enqereyê jî rawestiya û daxuyand ku di pêvajoya Enqereyê de 22 xal hebûne, ji van 22 xalan bi tenê yê li dijî kurdan hatine cih; wekî valakirina Kampa Etrûşê, li dijî PKK'ê şerkirin û zêdetir belavkirina nav û daxwazên tirkmenan. Zübeyir Aydar dide xuyakirin ku ji bo pêkhatina Kongreya Neteweyî, ji mêj ve xebatên PKDW'ê hebûne, lê ev xebat ji ber helwesta PDK'ê neçûne serî. Aydar wiha axivî: "Di axaftinê de bi gîştî hêzên Başûr nêzîktêdayîneke erênî nîşan dan, lê PDK'ê ji dêl ve ku piştigiriyê bide xebata Kongreyê Neteweyî, pêvajoya Enqereyê peşand, me projeyek amade kir û pêşkêşî PDK'ê kir ji bo çareseriyê neteweyî, lê PDK'ê pêvajoya Enqereyê peşand." Aydar diyar kir ku êrişên artêşa tirk û PDK'ê yê li ser PKK'ê jî, ji pêvajoya Enqereyê derketine. Aydar wê yekê wekî îxaneta PDK'ê bi nav dîke û dide zanîn ku PDK bi van kirinên xwe tecrît bûye û roj bi roj di nav xiyanetê de dixewîne.

## PDK'ê hevalbendîya bi dijmin re tercîh kir

Aydar li ser helwesta rêxistinên Başûr jî rawestiya, da xuyakirin ku helwesta hêzên başûrî bi gîştî baş bûye û heta PDK'ê

ji erênî lê nihêriye. Li aliyê din di destpêkê de YNK jî hinekî sar bûye, lê wê gavê ew jî têgihîştine ku dewleta tirk, ne tenê dijminê şoreşa Bakur e, ew dijminê şoreşa Başûrê jî. Ji ber wê yekê ew jî bi dil û can nêzîkî pîrsgirêkê dibin. Aydar li ser helwesta dewletên ereb jî diyar kir ku di çapemeniya wan de tiştê li dijî wê civînê demeketiye, lê wan bi awayekî dewleta tirk rexne kirine ku ji başûrê Kurdistanê derkeve.

Li gorî daxuyaniya Aydar berê jî wan li Brûkselê sê civîn ji bo yekîtiya neteweyî çêkirine. Komîteyêke PKDW'ê ya pêwendiyên heye, ev komîte ji mêj ve ji bo vî karî xebatê dîke. Li aliyê din Aydar dide zanîn ku dewleta tirk bi wê operasyonê dawî jî helwesta xwe ya li hemberî kurdan daye der û PDK jî bi hevkarîya dewleta tirk ve îxanetê dîke. Her wiha Aydar dadixuyîne ku ev operasyon jî wekî operasyonên-din ji serî ve têkçûyî ye û dewleta tirk dixwaze tengavbûna xwe bi van operasyonan ji navê rake.

## Gelê kurd îxanet baş nas kir

Her wiha me bi rîya telefonê li ser civînê û rewşa dawî agahî ji Endamê Komîteya Rêveber a PKDW'ê Remzi Kartal, ku wê gavê li başûrê Kurdistanê ye û di çêbûna civînê de xwediyê rîstêke girîng e, standin.

Kartal, berê pêşîn dide zanîn ku konferansa Kongreya Neteweyî bi beşdariya bi sedan hunermend, kesên navdar û nûnerên 16 rêxistin û partiyên kurd hatiye pê. Ev civîn ji bo ku Kongreya Neteweyî di sala 1998'an de pêk were wekî amadehî hatiye lidarxistin. Wê di 13 û 14'ê berfanbarê de jî li Brûksela Belçîkayê civîneke berfirehtir çêbe. Komîsyonek li başûrê Kurdistanê hatiye avakirin, wê komîsyonek jî li Brûkselê bê avakirin, ev her du komîsyon wê bi hev re xebatên amadehiya Kongreya Neteweyî bikin. Kartal gotina xwe wiha domand: "Ev ne konferanseke cografîk e, ev konferanseke neteweyî ye. Ev konferans di qada navneteweyî de wê piştewaniya doza gelê kurd bike û bibe dengê gelê kurd. Wê di rojên 13 û 14'ê mehê de wê komîteya amadekar li Brûkselê bê hîlbijartin, biryarên ku komîteya amadekar digire wê li Başûr jî komîteya ku hatiye hîlbijartin bi cih bî-

ne."

## Dewletên herêmê çareseriyê dixwazin

Kartal li ser pîrsa me ya bi rengê, "Tirkîyeyê helwesta xwe bi operasyonê nîşan da. Gelo helwesta dewletên ereb çawa bû li hemberî wê civînê?" jî ev tiş got: "Bizava neteweya kurd li Rojhilata Navîn gihîştîye asta dewletbûnê û di wê astê de hin îtîfaq çêkirine. Li aliyekî îtîfaka PDK'ê û Tirkîyeyê heye, ku êriş ser kurdan dikin, wekî din em tu êriş û helwestên dijber ên dewletên din nabînin. Li gorî ku em ji weşanên wan fêhm dikin, êdî ew jî gihîştine wê encamê ku, divê ev pîrsgirêk bi awayekî siyasî bê çareserîrin." Piştî wê bersivê dema me got: "Gelo ev pêvajoyê ji bo Kurdistanê serbixwe gawe e?" Kartal ev bersiv da: "Wekî her gelî mafê gelê kurd jî heye ku bibe xwedî dewlet, lê berî dewleteke serbixwe divê di mêjiyê kurdan de yekîtiyek ava bibe, di qanûnan de yekîtiya çêbe, divê gelê kurd di nîrxên xwe de bibe yek. Divê berê pêşîn di navbera her çar parçeyên Kurdistanê de federasyonêk pêk were û yekîtiya wan însanên me pêk were."

Kartal li ser rewşa şer a dawîn jî rawestiya û daxuyand ku operasyona dewleta tirk a dawîn jî ji aliyê gerîla ve vala hatiye derxistin. Hêzên dewleta tirk li Heftanînê li hemberî berxwedana gerîla tîk çûne, mecbûr mane ku paş ve vegerin. Li gorî daxuyandina Kartal ev operasyonêke psikolojîk bûye û tu tesîr jî li ser xebatên wan nekiriye.

Remzi Kartal sala 1997'an wekî sala finalê ya şoreşa kurd destnîşan kir û dîmenekî bi vî rengî nîgar kir: "Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê di sala 1997'an jî aliyê leşkerî ve serkeftineke zor baş bi dest xist. Ji layanî îxanetê ve îxanetkarên kurd di nav milletê kurd de zor zor baş hatin naskirin, ji layanî dîplomasiyê ve serkeftineke pir hêja hate bidestxistin. Wê sala 1998'an jî ji bo yekîtiya û netewebûna kurdan zor baş û girîng be. Di bizava neteweyî de wê pengaveke zor zor baş dest pê bike. Sala pêşiya me ji bo bizava şoreş û azadiya Kurdistanê saleke zor zor pîroz e."

M. AKSOY

## Kurtenûçe

Bîrdoza dewleta tirk nîşan dide ku îro li Kurdistanê ne bi tenê kurd, her wiha Kurdistanîyên din jî çî sûryanî, keldanî û ermen jî di bin pest û kotekiyê de ne. Hate ragihandin ku di mehên derbasbûyî de perwerdehiya olî ku li Manastira sûryaniyan a li Mêrdînê, ji hêla waliyê Mêrdînê Fikret Güven ve bi hinceta ku "hebûna dewleta tirk tehdît dîke", hatiye qedexekirin. Li ser wê yekê parlementerê CHP'ê Ercan Karakaş bi mebesta ku Wezîrê Karê Hundi-rîn Murat Başesgioğlu bibersivîne pîrsnameyek pêşkêşî meclîsa tirk kir.

Li dijî xebatên Wezîrê Dadê Oltan Sungurlu ku dixwaze li girtîgehên siyasî "Sistema hucreyan" pêk bîne, li tevahiya Tirkîye û Kurdistanê li 60 girtîgehên nêzîkî 13 hezar girtiyên siyasî dest bi çalakiyên protestoyî kirin. Di van çalakiyan de wê di hefteya 1'ê de, di rojên hevdtînan de wê slogan bîne avêtin, belavok bînin xwendin, name bînin nivîsin, di hefteya 2'an de wê deriyên baxçeyan heta seat 24:00'an neyê girtin, malbat wê ji bo ku herin serdana dozgeran bînin şandin. Di hefteya 3'an de jî, hejmartin ji dudiyên wê bê 1'ê wê ji hêla malbata ve li ber girtîgehê daxuyani bînin xwendin.

Roja 13'ê berfanbarê wê ji hêla Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve li Mecidiyeköy Kültür Merkezi sempozyûmek bi navê Kültür-Sivil Toplum-Devlet bê lidarxistin. Wê sempozyûm jî du beşan pêk bê. Wê ji hêla Sungur Savran ve bêrêvebirin. Di wê beşê de wekî axîfger ji Zanîngeha Bilgîyê Me-te Tuncay, Cengiz Çandar û Serokê Înstîtuya Stenbolê Şefîk Beyaz wê biaxivin. Beşa duyem jî hêla nivîskar Îsmail Gölbaş ve bê bêrêvebirin. Di wê beşê de jî Haluk Gerger, Koray Düzgören, Melik Fırat û Mahir Kaynak beşdar bibin.

Roja 7'ê berfanbarê li Bayram-Şapa Spor Komplexiyê bi beşdariya 3 hezar kesan kongreya awarte ya HADEP'ê li dar ket. Di kongreyê de serokê berê yê HADEP'a Stenbolê Hikmet Fidan axivî. Fidan got: "Em berpirsiya kêmasiyên heta îro digirin ser xwe, ji bo serkeftinê jî ji hevalan spasiyên xwe pêşkêş dikin." Piştî axaftina Hikmet Fidan, Serokê Gîştî yê HADEP'ê Murat Bozlaş axaftinek kir. Bozlaş di axaftina xwe de li ser nîqaşên berdana Leyla Zana rawestiya û derheqê operasyona Başûr de jî got ku divê artêş vekêşe. Di encamê de Av. Mahmut Şakar bû serokê HA-DEP'a Stenbolê.



# Mirov bi xweziyê nagihê keziyê

Gotinek heye di wêjeya kurdî a devkî de. Ji bo kesên jêhatî, zîrek, gorbiçav, jîr û zana tê gotin:


“Mîna kewê teqlê”

Kew an kevok, di wêjeya gelên din de jî wekî dawera (sembol) aşiyê tene nasîn. Mirov kew, wekî qasidê aşiyê jî dinase. Xwedîkirin û hezkirina kewan jî ji mêj ve wekî kevneşopiyekê didome. Îcar rastiyeke balkêş heye ku di nava refên kewan de, celebek ji wan bawerî û dilxwaziya xwediyê xwe bi dest xistiye. Ev jî “Kewê teqlê” ye. Gava ku ew kew difire, bilind dibe, bilind dibe û dûre teqlan diavêje heya tê erdê. Ev hunera kew, ji bo xwedî ji bilî kêf û dilşadiyê, serbilindiyeke mezin e jî.

Belê Ferhat Kurtay tenê ne çavşîn bû ji bo gelê kurd. Ew bi xwe “Kewê Teqlê” jî bû. Li beriya Qoser û Dêrika Çiyayê Mazî ku navçeyên herêma Mêrdînê ne, gel ev nasnav lê kiribû. Ferhat bi zanatî û hişmendîya xwe her dem li nav çavên kevneperestiyê dixist. Serfirazî û biserketin hunera wî bû. Gava ku diaxivî tu car nedixurcilî, mîna hostatiya kewê teqlê bi dengê zelal û bi zanîna kurdî agahî di mêjiyê mirov de diheland. Bi hemû taybetiyên xwe hezkirin û dilxwestina mirovan dicivand ser xwe, raman û bîrdoziya ku diparast bi wan dida pejirandin.

Sal 1979... havîna salê bû, Ferhat hat gundê me Şabana ku bi navçeya Dêrikê ve girêdahî ye. Birayê min Îzedîn di nava xortên gund de wekî xortekî jîr û zana dihat zanîn û li ser ciwanên gund gotinên wî pere dikirin. Ferhat ev yek bihîstibû ku bi vê sedemê poşa xwe têxe nav gund. Ew û du hevalê wî, bi texsiyekê hatin. Navê Ferhat wekî efsaneyekê belav bûbû. Gava ku min hatina wî bihîst, bi lez û bez ez çûm hinda wan, ji bo ku bibînim ka wê çi biaxivin, di guftûgoyê de wê kî bi ser bikeve. Ev ji bo min degeleke (mêraq) mezin û zarokî bû. Wê demê ez 13 salî bûm. Salên berî cuntaya leşkerî bûn, dewlet û hêzên wê hê li holê tunebûn. Di van salan de berpîrsên hemû rêxistinên wekî KUK, DDKD û APOCÎ, li nav gel digeriyan, gengeşiya xwe dikirin, gel zana û hişyar dikirin. Gundê me hevalbendiya tu rêxistinên nedikir, wekî alîgirê komekê nedihat nasîn. “Serbixwe” dihat binavkirin û ji nav rêxistina DDKD’ê veqetiyabû. Ji gundê me tu kesî ji Apociyan hez nedikir. Dihat gotin ku Apocî bi tîrs û xof in. Lê gava mirov pêşewa û Apociyê nola Ferhat didîtin ev pêşdarazî dihat şikandin.

Em vegerin ser guftûgoya Ferhat û birayê min Îzedîn. Birayê min zana û jîr dihat nasîn û di vî warî de em pê bawer bûn. Lê niha li hemberî wî yekî



Berî her tiştî em bi xwe bawer in, em bi gelê xwe bawer in. Lê belê xelasiya Kurdistanê ne wihanî hêsan e. Pir riyek dûr û dijwar e. Armanca me ew e ku, em vê riyê kin bikin û diwariyê veguherînin hêsanîyê. Em û tirk wekî porê li hev geriyayî û girêkûtik lê ketiye di nava hev de dijîn.

Ji hev qetandina me dijwar e.  
Divê ev girêk bê vekirin û porji şeh bibe,  
da ku ji nava hev derkeve...

wekî Ferhat hebû. Havîn bû û kelakela germê bû. Ew dipeyivîn, gava ku tî dibûn av ji min dixwestin.

Birayê min li hemberî Ferhat kete tengasiyê, çapik li ber wî negerand. Germa havînê û zanebûna Ferhat bûbû yek, birayê min di nav xwîdanê de ma bû. Piştî 18 salan ezê nû mikur bêm, ji ber zanebûna birayê xwe ez jê dibehcim da ku çima ez bi qasî wî ne zana me. Bi sedema li hemberî Ferhat di guftûgoyê de biserketî bû kêfa min dihat. Îcar min ji xwe re digot, divê ez bi qasî Ferhat zana bibim.

## Hecî Şêxo û Ferhat

Riya Ferhat tu kesî nikaribû bibire, ew diçû her deverê Kurdistanê, ji axê heta teht û zinaran ji dilê însanan heta mêjiyê wan mirov li rêça wî rast dihat. Careke din hat gundê me. Li gund mirovek bi navê Hecî Şêxo hebû. Wî kesî, her dem qerf û henekên xwe bi kesên ku dibêjin, ‘ez kurd im û emê Kurdistanê ava bikin’ dikir. Di nava mirovên gund de fesadiyek feodalî dikir, dixwest, însanan bera hev bide (niha çûye dinya din!) Gotineke wî hebû:

“Hohe we Kurdistan ava kir, ka tanqên we, ka topên we? Ma hûnê bi darê şivantiyê Kurdistanê ava bikin?”

Ferhat li nav zilamên gund rawestiya û gelek mirov lê vehewiyan. Di nava zilaman de Hecî Şêxo jî hebû. Ferhat ew nas nedikir, lê wî Ferhat nas dikir. Wî dixwest li Ferhat guhdarî bike, ka çi çiqas zana ye, li gorî navê xwe ye an na? Bi meroqeke mezin hat guhdarîkirina Ferhat.

Carê axaftina Ferhat bîriya û pîrs dikirin. Tê bîra min Ferhat bi zimanê kurdî li ser nakokiya civakî û yekîtiya dijîtiya diyalektîkê radiwestiya. Heman wisa digot:

“Di jiyânê de hemû tişt li hemberî hev in. Wekî şîn-sor, gir-çal, li dijî hev in. Her dem jiyân û mirin bi hev re şer dikin.” Di encamê de têkilî bi civaka kurd ve girê da.

Hêvî li Şêxo tefiya bû, mest bû û belkî yekemîn car nebaweriya wî ya li hemberî avakirina Kurdistanê veguherîbû baweriyê, di dil û mêjiyê wî de bi hostatiya pêşewayê xurt Ferhat, Hecî Şêxo mîna ava di sîtîla li ser êgir de dikeliya û di ser hev re diqulipî bi vî alî û bi wî alî de. Nesekînî û wiha got:

“Ferhat rast dibêje, wekî wî ye, birazê xebera te ye.” Dizivire ser mirovê teniştî xwe: “Xortên me yên gund tiştên wihanî ji me re nabêjin. Xortên me bi gûyê xwe nizanin.”

Hecî Şêxo hew xwe girt û wiha got:  
– Biraziyê Ferhat hûnê Kurdistanê kînga ava bikin?

Ferhat pîrsa wî wihanî bersivand.

– Apê delal, berî her tiştî em bi xwe bawer in, em bi gelê xwe bawer in. Lê belê xelasiya Kurdistanê ne wihanî hêsan e. Pir riyek dûr û dijwar e. Armanca me ew e ku, em vê riyê kin bikin û diwariyê veguherînin hêsanîyê. Bila em di bin destên fransizan, îngilizan, almanan de bûna, lê em ne di bin destên tirkan de bûna. Em û tirk wekî porê li hev geriyayî û girêkûtik lê ketiye di nava hev de dijîn. Ji hev qetandina me dijwar e. Divê ev girêk bê vekirin û porji şeh bibe, da ku ji nava hev derkeve...”

Hecî Şêxo bêaram xwe di nava peyva wî ra kir û got:

– Tu çiqas xweş dibêjî, çiqas zana ye. Xwezî ez ji bi qasî te zana bûma.

Ferhat ew bi kurtasî bersivand:

– Apo mirov bi xwezî nagihê kezî. Divê insan bixebite. Her kezîsorek xwîneke sor dixwaze.

**Têbînî:** Ev nivîs beşdarî pêşbazîya kurteçîrokên a TAYD-DER’ê bûbû. Ji ber ku navê nivîskar xuya nedikir, em kurteçîrokê bênav diweşînin.



# Azadiya Welat rojnameyeke çawa ye?

Dema ku mirov vê pirsê ji xwe bipirse, pir tişt tene ber çavên mirov. Mirov dikare bibêje di warê rojnamevaniya kurdî de, Azadiya Welat valahiyeke mezin tijî kiriye. Her çiqasem wekî girîngiya wê bala xwe nedine û em li gorî pêwîstiya wê beşdariyê di karê wê de nekin jî, em dixwazin ku rojnameyeke rind, hêja û bi rûmet bi zimanê me, bi kurdî derkeve. Ji bo vê sedemê tevî hemû kêmasiyan xwe jî em dixwazin Azadiya Welat hinekî binirxînin, hinek pêşniyarî û rexneyên xwe pêşkeş bikin.

## Divê Azadiya Welat ji aliya teşe ve bibe rojname

Berê em dixwazin li ser şikl û dirûvê wê rawestin. Azadiya Welat rojnameyek hefteyî ye. Lê ne wekî rojnameyan, ne jî wekî kovaran dixuye. Di navbera herduyan de ye. Heke ew bi heşt rûpelên mezin, mîna rojnameyên bi rojane derkeve wê hîn baştir bibe.

Di mijara zimên de jî tevlihevî pir e. Nivîs bi piranî bi rêzik û rîstên ku ji hev çuda ne tene nivîsandin. Heke rojname bi rîst û rêzdar be û her nivîskar jî, li gorî rêzdariya xwe, naveroka nivîsan xera neke û biweşîne, wê jî bo pêşketina ziman hîn baştir bibe. Dike ku wî çaxî nîqaş û şîroveyan li ser zimên berfi-

rehtir bibin. Heke rêzdariyeke wisa bimeşe wê jî bo fêrbûna zimên jî, xwendevan zêde jî bibin. Lewre xwendevanên zimanê kurdî, berhemên mîna Azadiya Welat ji xwe re pêşawa dibînin. Wê mîna fêrgehê li ser rêzik û rîstên Azadiya Welat rawestin, nîqaş û şîroveyan xwe fireh bikin, ji ber ku nivîs hemû ne bi heman rêzik û rîst tene nivîsandin, mîna nakokiyên xuya dike. Bi piranî ew dewlemendî ya zimanê kurdî xuya nake, lê serê hinek xwendevanan

wîst e ku mirov zanibe wan bi kar bîne. Em bawer in ku rojname nûçeyên wisa bibijêre, li ser nûçeyên wisa raweste, dê ew valahî jî tijî bibe.

## Divê jiyana berê û ya niha rûberî hev bike

Pêwîst e ku Azadiya Welat hinekî bêhtir li ser bîngeha ziman û firehkirina ferhengê raweste; hem ferhengok berfireh bibe, hem jî biwêjên ku ji

kurdî çêbibin û wêjeya berê û ya îro bi hev re bi kar bê, em bawer in ku ev yek dê bibe sedema pêşketina wêjeya kurdî.

Bi piranî ger hevpeyvîn bi koçber û penaberên cîhanê û yê Kurdistanê re di mijareke zanîstî de çêbibin, wê pir balkêş be. Heke rojname bi rewşenbîr û zanyaran re di mijara çînî de hevpeyvînan çêbike, fikr û ramanên wan binasîne û bîranînen şehîdê şoreşê bi lewnekî (şêwe) wêjeyî bîne zimên, dîrokî û erdnîgariya Kurdistanê binasîne, hem wêjê û hem jî danasîn bi hev re pêk tê. Ku hinekî jî li ser têkiliyên gelan raweste, bi piranî gelên Rojhilata Navîn û gelê kurd, ji dîrokê heya îro çawa meşiyane, bi cîrantiyeke bi rûmet jiyane an na û sedemên wê yekê bîne zimên, wê balkêştir be. Kurteçîrok, pêkenok, metelok û xaçepirs ji balkêş in. Cihê wan hîna firehtir û dewlementir bibin, çêtir e.

Dibe ku ev nirxandina me hinekî kêmtir û nirxandineke hêsan be, lê ancax em dikarin wisa binirxînin, lewre, ji du mehan carekê Azadiya Welat dikeve destê me, carina çend hejmar bi hev re tên. Bi wê sedemê li qada me jî bi germahî nirxandin çênabin. Dema ku di wextê xwe de bigihêje destê me emê karibin hîn bi baldarî li ser rawestin û nirxandinên berfirehtir bikin.

M. EMÎN ALTOX

Di mijara çandê de, heke bi dirûvekî ku wê jiyana kevn û nû rûberî hev dike, li ser mijarê xebat çêbe, dê bêhtir bala xwendevanan bikişîne.

Her wiha heke lêkolîn li ser astengên li ber wêjeya kurdî çêbibin û wêjeya berê û ya îro bi hev re bi kar bê, em bawer in ku ev yek dê bibe sedema pêşketina wêjeya kurdî.

di mijara zimên de tevlihevî dike. Ev jî bilî zaravayan e. Wisa diyar e ku têkiliyên rojnameyê û xwendevanên zimanê kurdî qels in. Xurtbûna têkiliyên bi gel re xwendevanan jî pir dike.


Di mijara nûçeyan de, em tevlihevî hevalê Sami Tan dibin, lê nûçeyên wisa he- ne ku her dem di rojevê de dimînin. Pê-

kurdî tevli tirkî bûne binivîse û bê ka bi çi sedemê tevli tirkî bûne, nîqaş û şîroveyan li ser wan çêbike.

Di mijara çandê de, heke bi dirûvekî ku wê jiyana kevn û nû rûberî hev dike, li ser mijarê xebat çêbe, dê bêhtir bala xwendevanan bikişîne. Her wiha heke lêkolîn li ser astengên li ber wêjeya

## Kurd kurd e çi leşker çi sivîl

OSMAN ÖZÇELİK



Mêrikê kurd e' gundî, diçe leşkeriyê. Tep û rep piçekî hînî leşkeriyê û tirkî dibe. Piştî sê çar mehên perwerdehiyê, wekî hostenefer wî didin qereqola gundekî herêma Trakyayê.

Rojeke havînê ya germ, ku li ber tavê av di misîn de dikele. Mêrikê me û hevalekî wî yê leşker ku tirk e, derdikevin dewriyeyê. Di kelekala germê û di bin barê rext û tivingê de, ji tîbûna bihecîne. Li rexê rê, bîstaneke zêbeşan dibînin. Dibêje: "Hevalo, wele em ji germa fetîsîn, ka em ji xwe re zêbeşekî jê bikin." Hevalê wî dibêje: 'Na' jî, ew hema ji hîmekê zêbeşekî jê dike û kêrê diavêjê. Zêbeş kal be jî, xem tune, dê tîbûna wan piçekî bişkîne. Bi gezan diçin zêbeş û hema wê gavê xwediyê bîstan li wir peyda dibe. Bê "sewal û cewal" bi daran pê dikeve û wî ji halekî dixê halekî din. "Lawo.... lawo!" ya mêrikê me qet fêde

nake. Çawa bêyî xwediyê bîstan zêbeş jê kiriye? Ey dizî ye... Mêrikê me polî poşman kum ji serf ketiye, ji nava lemên zêbeşan hildigire, dide serê xwe û zû bi zû ji nav lepên xwediyê bîstan xelas dike û bi riya xwe de diçin.

Dem digere, sal werdigere, leşkeriya camêrê me diqede, vedigere gundê xwe.

Gundî yê, tu karê ku bike tune, zeviyeke wî ya biçûk heye. Radibe ji xwe re dajo û dike bîstan. Ew û jina wî, bi zarokên xwe ve, bi şev û bi roj li ber bîstêna xwe ne. Li hêviya bûyina bîstan in ku berê bîstêna bifiroşin û debara xwe pê bikin. Deyn li ber qirikê ye. Mala Xwedê ava be ku bîstanê wî zehf zêbeş girtiye.

Rojeke havînê ya germ ku li derve hêk dipije. Mêrikê me di bin siya holika nava bîstan de pal daye, zarokên wî li dora wî ne, dilîzin.

Bi carekê ve dibîne ku du leşker ketina nava bîstêna. Ji xwe re dibêje tiştê nabe, de qey feqîr tî bûne, an dilê wan bijiyaye zêbeşan. Bila ji xwe re jêbikin û bi riya xwe de biçin. Belê ew çi ye?... Leşker zêbeşan dişikînin, ku ne sor be diavêjin. Û yekî din jê dikin. Ne yek ne dido û ne sisê... Mîna malê talanê, pê ketina zêbeşan diperçiqînin û diavêjin erdê. Ji dûr ve gazî wan dike ku leşker rawestin, belê qet guhdariya wî nakin. Bîstana ji

malê mîratê xerabtir dikin. Mêrikê bi bazdan bi ber wan diçe û dibêje: "Hûn ji Xwedê natirsîn!..." Hîna peyva wî di dev de neqediya bû, ji nedî ve qûntaxa tivingê li sîngê ket û li ser piştê di nav lemên zêbeşan de dirêj ma. Bi postalan çend pehn jî ji qorika xwe xwar, çawa dikaribû li hemberî leşkerê tirk rabûya?... Leşkeran xwe di ber kûçikên mîna wî de didan kuştin. Leşkeran ji bo namûs û can û malê wan hezar zehmetî dikişand û wan jî pirsê çend zêbeşan ji leşkeran dikir. Jixwe ev kurdên hov tu caran nedibûn insan û dev ji xayîntiya xwe bemedidan!..

Camêr bi parsûyên şikestî, bi rojan di nav nivînan de ma. Ji gundî û cîranên ku dihatin serdana wî re digot: "Bila hûn sax bin, belê nizanîm emê çi bikin.", radibû serpêhatiya xwe ya dema ew li Trakyayê leşker bû digot ku bê çawa xwediyê bîstan e tirk ew kotek kiriye. Û digot: "Em leşker bûn sivîlan li me didan, em sivîl in leşker li me didin, gelo ev çi ecêb e?"

Li me HADEP'ê jî (tam ne wisa be jî) wilo hatiye. Di van rojên dawiyê de dijmin nahêle em bêhna xwe vedin... Xem tune... Em dibêjin "Dijminatî bêminetî ye", lê belê em nizanîm dost ji me çi dixwazin? Bi xwezayî aciziya me ne jî rexneyên dostane ye...



# Temenekî kin û jiyaneke mezin: **Bermal**

**B**ermal li gundê Liçika Hecî Şemso ku girêdayî navçeya Hezoyê (Kozluk) hatiye dinyayê. Rewşa malbata wê ya aborî ne baş e. Li gundan, jinên kurd pir rebenî û belengaziyê jiyana xwe derbas dikin. Tu mafê wan ê jiyane tune, jin karê malê dikin, zarokan mezin dikin, paletiyê dikin, piştîyê hejikan ji çola tînin, berdêlî dibin, pir caran jî di berberiyê de tînin pîjîrandin. Lê Bermalê ev şexsiyeta jinên kurd ji biçûkayî de qebûl nekiriye.

Ew ji gundê mala xaltîka xwe. Piştî hemû bêmecaliyan û tevî ku dibistan jî nexwendiyê, ew serî li karistana tûtinê dixê û ji bona mafên xwe yî aborî kar bike, dikeve kar. Lê di nav jiyane de tu mafê çewt neparêze, ew jiyana maldaran û cilên wan û şaşîya wan hêvî nake, ew cilên li gorî edet û toreyên kurdî li xwe dike û alîkariya birayê xwe û zarokên wî dike, lê di vê holê de jî bi fikr û ramanê neteweyî hesiyaye, dilgermiyeye mezin pê re çêbûye. Dijmin jî her gav mala xwişka wê nerihet dikin, lawê xwişka wê Çetin Abay hebû. Hêja ji biçûkahiya wî ve ew digirtin û îşkenceyên xedar lê dikirin. Ev lawkê ku hê nestewiyabû, ku dibistana navîn dixwend, tûmê taybet di îşkenceyan de, stûwe wî felc kiribûn. Tesîra van zilma hemû kîneke mezin li dijî mijokdariyê xistibû dilê Bermalê. Jixwe te digot Bermal ji zarokatiya xwe ve miroveke îlegal e, di nasnameyê de, navê wê Güler Otaç bû, li mal û di nav gel de jî Şikran bû û di nav şervanê ARGK de jî Bermal bû. Jiyana wê ya Êlihê û karistanê hemû bi şoreşgerî derbas bûbû. Li serhildanan, li newroza, li cejnên 1'ê gulanê, di govenda welatparêzan de mîna pêşengeke tim li ber çavan bû.

Berî ku Bermal tevli nav şervanê ARGK'ê bibe, min ew dît, li bajarê Êlihê li qadekê govendek digeriya, saz û awazan lê dixist. Bermalê serê govendê dikişand. Rihê we dida gotin ku ew kurdeke şoreşger a mezin e. Ber bi sazband dimeşîya. Radihişte mîkrofonê bi dengê hez digot: "Kî zava kî zava Kurdistan zava" ez tu car van gotinên wê jî bir nakim.

Mirovê ku ew nas nedikirin biryar dabûn, digotin ev gerîla ye di wê keliyê de di dilê gel de cih girtibû.

Piştî wê rojê me hev du nas kir, pir caran me sohbet kir, qîzeke dilê wê bi agirê şoreşê dikeliya, rizgariya gel û welat armanca wê ya herî pêşîn bû. Pir dilsoz bû, hevkar bû, sal 1991 bû li bajarê Êlihê nêzî nexweşxaneyê sigorta çend polis navrojê hatibûn kuştin, li ser vê mijarê Bermal û şehîd heval Remezhan Şat hatibûn girtin. Pir îşkenceyên giran li wan kiribûn. Destê Bermal di "Filistin Askisi" de şikestibû, lê wan tu agahî nedabûn dijmin. Piştî ku ji binçav derketin, dijmin ew sirgûnî Meletiyê kiribû û Remezhan jî



## Bermal

*Tu keça jîr î Xerzan î  
Tu kela germî ya deşta Heran î  
Tu çeka serê Cudî  
Kulîlka nava Serhed û Botanî  
Kara xezalan î li zozan î  
Tu serhildana li Koçgirî  
Li kevela Dicle û Fîrat şitlek rihan î  
Bêhn dide hemû Kurdistanê*

sirgûnî Rihayê kiribû. Remezhan li Rihayê jî aliyê kontrayan ve bi bêbextî hat şehîdkirin. Bermal ji vejeriya Êlihê, lê li Êlihê di rojê de şeş mirovên welatparêz jî aliyê kontrayan ve dihatin şehîdkirin, yek ji wan kurê xwişka Bermalê berpirsiyarê kovara Özgür Halkê yê Êlihê Çetin Abay ê din jî birayê Bermalê Faik Otaç bû.

Gava ku birayê Bermalê Faik tê şehîdkirin, Bermal xeberê dibihîze çawa digihêje devê deriyê nexweşxaneyê ku tîjî timê taybet in, Bermal bi dengê bilind dibêje: "Bimre nîjadperestî, Faik tenê ne birayê min e, şehîdê Kurdistanê hemû birayê min in. Bawer nekin ku wê xwîna şehîdan li erdê bimîne. Dûr-nêzik ê heyfa şehîda bê hilanîn, dê dijmin di xwîna ku rijandiyê de bixeniqin." Timên taybet bi xezab êrîş dikin û lê dixin, wê davêjin nav piyên xwe. Lê ew ranaweste û di nav destê wan de dibêje: "Bijî Serok Apo, Bijî Gerîla, Bijî PKK, şehîd namirin..."

Di jiyana Bermalê de tiştekî ku

bala min kişand jî dîsa di sala 1992'an qewimî. Bi navê Metîn xortekî welatparêz hatibû şehîdkirin, gel civiya ku bi xwepêşandaneke mezin wî bibe goristanê, tûmê taybet pêşîya gel girtin. Gel jî çok dan erdê, gotin ku hûn rîya me venekin em jî ji rê dernakevin. Timên taybet jî digotin bila jin li otobûsan siwar bibin herin ser goristanê, mêr jî belav bibin. Gel û tîman li ber hev dan, tîman wê keliyê êrîşî jina kir ku wan rakin û li otobûsa siwar bikin. Bermal bi hêrs rabû êrîşî serokê saziyên demokratîk kir, got: "Hûn çima bêdeng dimînin, lê temage dikin? Serokê HEP'ê û Komeleya Mafên Mirovan ê Êlihê û sendikavanan şermezar dike. Di hemû xwepêşandan de Bermal pêşengeke jîr bû.

Bermal bi rastî mûciziyek bû di dîtin û ramanên min ên taybet de. Qîzekê dibistan nedîtibû, perwerdehiya civaknasî û bîrdozî nexwendibû. Lê te digot qey bi çand û hunera kurd tê xwedîkirin jî dêl

nan û avê ve, wê hemû helbestên marşê şoreşgerî ji ber xwe zanibûn, folklorê kurdî hemû zanibû. Û bi rihêkî bi serûber dijiya, gava ku ez dîtin û ramanê serok li ser şexsiyeta parastina partiyê guhdar dikim, helwest û şexsiyeta Bermalê tê ber çavên min. Serok di axaftineke xwe de digot berxwedana me yî mirovahiyê ew e ku em bigihêjin şexsiyete xwezayî. Bê nexweşiyên bindestiyê, bê fen û fûtên nîjadperestiyê, mirove rast, paqij û xwe jî qîrêjiya jiyana dijmin qut bike, mîna çivîka ku hêlîna xwe ji hewşîka mara dîr, li serê daristaneke bilind çêbike, divê jiyana mirove kurd jî ji sînorê dijmin ew qas dîr be. Mîna ku serok dibêje: "Mirov şer bike, dê azad bibe, mirovê azad xweşik e, mirovê xweşik jê tê hezkirin." Bermal di vê pergale de dijiya heya şehadeta xwe.

Bermalê pir jî zakokên kurdan hez dikir. Digot hevalên welatparêz nemîne ku hûn guh bidin banga MGK'ê, hûn bes zarokan binin, divê malbatên welatparêz zarokên wan zêde bin, her roj dijmin me qir dike, divê cihê yekî bi hezarî bê dagirtin. Dema wê zarokên welatparêzan didîtin pereyê berîka xwe tev li wan belav dikirin. Wê jî kurê hevalekî re bi destê xwe ji risê kesk û sor û zer fanerak çêkiribû, roja ku ew giha şehadetê, heval ew faner hilanî, got ku ew keda destê wê nûra çavê me ye, ezê hilînim, gava kurdan mafê azadiyê stand, mûzeyê şehîdan çêbû, ezê vî fanerî li wir bidim daleqandin. Keda wê bila xuya be.

Li Êlihê rojêke dereba dikanan daxistî ne, hevaleke Bermalê ya karistanê jî dibêje: "Were emê herin arasê ji mal re şîvekê bikirin." Bermal jî dibêje: "De!", lê Bermal neketiye heya şîvê, ew diçe ka bê dikanên vekirî hene, lê nahêle hevala wê jî tê derxe. Diçin arasê ku dikaneke soffikî pîr bi tenê vekirî ye. Hevala wî pelê keleman bi sofî re bazar dike, Bermal dibêje: "Bisekine", lingê xwe li erdê dixê, dibêje: "Sofî te çima dikan vekirî?" Sofî dibêje: "Ji feqîriyê", Dibêje: "Sofî tuyê dikana bigirî", dibêje hevala xwe ya kar jî: "Wele te pelê wî nekirî" û dikevin rê, bi merşê "Xum xum jî çiyê tê/ dengê tivinga jê tê", dibêje. Roja pêşîn ku tevli nav şervanên ARGK'ê dibe, dertê pêş, dibêje: "Ezê ji gundiyan re axaftine bikim. Qomutan dibêje ku bike heval, hinekî li gorî jiyana çiya û gerîla xwe biparêze paş re tuyê pir bi gundiyan re bijî. Li Edene û Mersinê jî tekoşîna dide, pir astengiyên derbas dike. Lê di çalakiya dawî bi serkeftineke mezin li bajarê Sêwazê digihê şehadê. (29 kewçêr 1996).

Ev çalakî tirseke mezin dixê dilê dijmin.


Mizgîniya serfiraziyê û gemasiyê dide gelê Kurdistanê.



□ 17 Berfanbar 1959: Doza 49'an

Dewleta tirk bi îdiaya 'ajantî û cudaxwazyê' gelek ronakbîr û xwer-dekarên kurd ên ku li zanîngehên Stenbolê dixwendin girtin. Hejmara kesên girtî, di sala 1961'ê de gihîştê 50, yek ji wan di binçav de şehîd dikeve dimînin 49. Lewre jî ev bûyer wekî "Bûyera 49'an" tê zanîn. Di nav kesên ku "Doza 49'an" dihatin darzandî de kesên wekî Musa Anter, Yaşar Kaya û Medet Serhat jî hebûn. Dewlet pişt re jî dev ji wan kesan berneda bo nimûne, ji wan Musa Anter û Medet Serhat ji aliyê kontrayan ve hatin kuştin. Yaşar Kaya jî ji ber cezayên ku lê hatiye birîn, derket derveyî welêt.

## BÛYERINE JI DÎROKÊ



1969, berfanbar: Kovara Doğu dest bi weşanê kir

Di berfanbara 1969'an de kovara 'Doğu' (Rojhilat) dest bi weşanê kir. Di hejmara yekemîn de xwedî û berpirsê kovarê M. Güneş Şahin bûye, lê di hejmara duyemîn de Keman Mortan, Mehmet Şağay, Kabil Kocatürk ev kar hildane ser xwe. Li ser rûpela kovarê ya pêşîn dirûşmeya: "Bijî biratiya tirk û kurdan" balê dikişîne. Di kovarê de xêza weşanê wiha ye: "Kovareke anti-empyralîst, anti-faşîst, anti-asimilasyonîst, anti-feodal û anti-sovenîst e ku bi ronahiya sosyalîzma zanîstî li ser meseleya Rojhilatê disekine. Musa Anter, Mihri Belli, Hasan Arfa, Atilla Tokathî jî di vê kovarê de nivîsîne. Kovar ji 32 rûpelan pêk dihat û salê carek derdiket.

# Piştî du salan Koma Azad



Kom, stranên ku berî salên 1980'yî ji aliyê hin koman ve hatine gotin, berhev dike da ku wan pêşkêşî gel bikin. Ji gorî endamên komê armanca wan ew e ku stranên di nav gel de zêde belav bûne, berhev bikin.

**K**oma Azad demeke dirêj bû ku dev ji xebata muzîkê berdabû. Ji dema kasetaya xwe ya yekemîn ya bi navê "Şemal" derxistin û bi şûn de komê çalakîyên xwe dabûn sekinandin. Endamên komê belav bûbûn. Ev şeş meh in ku ji nû ve di nav NÇM'ê de ji bo kasetaya xwe ya duyemîn dest bi xebatê kirine.

Roja 7'ê berfanbara 1997'an Koma Azad li NÇM'ê derketê pêşberî beşdaran û bi repartû-areke berfireh konsereke ku du saetan dom kir, da. Repertûara Koma Azad bi giştî ji stranên gelêrî pêk dihat. Li ber stranên gelêrî hin marşên ku ji aliyê gel ve gelekî tene hezkirin jî hatin gotin. Koma Azad di konsera xwe ya li NÇM'ê de ne bi tenê stranên di kasetaya yekemîn de, hin stranên ku nû berhev kiribûn jî, pêşberî beşdaran kirin. Di konserê de bi awayekî zelal diyar bû ku gel jî bəriya awazên Koma Azad kiriyê.

## Xebatên komê bêhtir wê li ser stranên gelêrî bin

Endamên komê dadixuyînin ku, wê ew bêhtir li ser stranên gelêrî xebatên xwe bidomînin. Kom, stranên ku berî salên 1980'yî ji aliyê hin koman ve hatine gotin, berhev dike da ku wan pêşkêşî gel bikin. Li gorî endamên komê armanca wan ew e ku stranên di nav gel de zêde belav bûne, berhev bikin. Li hêla din

endamên Koma Azad diyar dikin ku, dema wan stranên bibêjin, ew tu car wan ji qalibên wan dûr naxin, lê wê pirdengiyekê li wan bar bikin.

Ji aliyê din ve di sohbeta me ya bi komê re derket holê ku, gel hê jî eleqeyê mezîni ji bo stranên ku li ser şoreşa Kurdistanê hatine çêkirin, nîşan dide. Li gorî gotina endamên komê stranên mîna "Şerê Azadî, Berxwedan xweş doz e, Hey Wedat û Bes e bes e delalamin" ji aliyê gel ve pir tene xwestin.

Endamên Koma Azad li ser komên muzîkê yên NÇM'ê jî dîtî û ramanên xwe diyar dikin. Li gorî Koma Azad komên NÇM'ê piştî sala 1994'an bêhtir li ser stranên gelêrî rawestiyane û ew otantîzma dîrokî bi motifên nûjen pêşkêşî gel dikin. Ji bo Koma Azad jî rewş bi vî rengî ye.

Endamên Koma Azad û peywira wan bi vî rengî ye:

Farqîn: Endamê komê yê berê ye û avakare koma nû ye, di nava komê de solîstiyê dike.

Memê: Tembûr, baxlama (nû ketiyê nava komê)

Mebîn: Bilûr, mey (nû ketiyê nava komê)

Newroz: Solîst û cura, (nû ketiyê nava komê)

Eledîn: Gitar, (nû ketiyê nava komê)

AZAD ALTUN

## ÇAVDÊRÎ

### Di jiyana komelayetî de cihê jinê



AMED TÎGRÎS

**L**i ser mafê jinan an jî, li ser çewsandina jinan heta îro gelek teorî derketine holê. Di vî warî de gelek pirtûk û berhem hatine nivîsandin. Lê hezar mixabîj dema ku mirov li rewşê dinêre, di navbera teorî û pratîkê de têvî û cudayiyên mezîni dibîne. Yanî gotin û kirin ne wek hevdu ne.

Hinek kesên ku ji xwe re dibêjin demokrat, pêşverû û sosyalîst, der barê mafê jinê de gelek tiştên xweş dibêjin û dinivîsînin, lê belê dema mirov li pratîka wan dinêre, ew bi xwe paşvemayî û demokratên serdema navîn (ortaçağ) in.

Mirov dikare bêje, gelo ev çima wiha ye?

Gelek sedemên ve rewşa berevajî û berpaşî hene. Yek jê hebûna kevneşopiyên pederşahî ye. Ew kesên ku di civakeke pederşahî de mezîni bibin, her çiqas ji aliyê bîr û baweriyê ve li dijî edetên civata xwe ya lipaşmayî derkevin jî, dîsa nikarin piştî û qirêjiya wê ji ser xwe bavêjin. Bi gotinê nabe, ji vî yekê re sal û perwerdeyêke dûr û dirêj divê. Di civata pederşahî de, ne bi tenê mîr, her wiha jin bi xwe jî, zû bi zû nikare ve perwerdeya koletiyê ji ser xwe bavêje. Ew niv otomatîk xwe kole û biçûk dibîne. Di hinek waran de civatê ew kiriyê robot û hiştîye. Ew nikare xwe ji robotiya hezar salî rizgar bike.

Sedemeke bingeîn a din jî, nezanî û nexwendîni ye. Civata ku jin lê nexwenda û nezan be, jixwe lipaşmayî ye. Kesên nezan nikarin xwe û civatê bi rê ve bibin. Jixwe wekhevî jî di civateke wiha de nabe û ne gengaz e.

Sedema sêyem jî aborî ye. Dema jin li der kar neke û li malê be û mîr jî li der kar bike, otomatîk wekhevî namîne. Jin dikeve bin bandora mîr. Heger jin xwenda be jî, zêde ferq nake. Girêdana wê ya aborî mercên wekhevîyê jî navê radike.

Li Ewropayê kême zêde ev yek di pratîkê de bi kar tê. Ji ber vî yekê jî, li welatên Ewropayê her çiqas kême be jî mirov dikare wekhevîya jin û mîrê bibîne. Bi taybetî ev li welatên Skandinavyayê pêşketîr e.

Ji sed salan ve heta îro gelek partî û kes, rizgariya jinê an jî wekhevîya wê bi tenê di civateke sosyalîst de dibînin. Ez bi xwe jî vî baweriyê ji sedî pîncî jî ne bawer im. Tecrûbeyên sosyalîzma reel jî li ber çavan in. Belê, Kuba û Çîn jî di nav de, rewş gelek zelal û vekirî ye. Di vî warî de gelek welatên kapitalîst ji wan pêşketîr in. Lê nayê wê wateyê ku jin li welatên kapitalîst azad in û wekhevîyê wan heye. Îro li Skandinavyayê jî her çiqas kême be jî ferqiyet di nav destmîz û maeşên jin û mîran de heye û mezîni e. Jin ji mîrên xwe lêdan û êşkenceyê jî dixwin. Lê bi ser vî yekê de jî mirov nikare di warê mafê jinê de Swêd û Tirkiyeyê an jî welateke Rojhilata Navîn bide ba hevdu û miqayese bike.

Em dev û dest ji wekhevîya kar û xwendîni berdin, ka em binêrin li Swêdê di dem û dezgehên dewletê de jinên ku wek şef an jî rektor kar dikin çiqas û çawan in:

Di warê lîstîkê û karên sosyalî de %71; di warê perwerdehiyê de %46; di karê rêveberiya fermî de %30; di warê bazirganî û hotel û restorantên de: %26; di warê banka û di warê sigorteyan de %22; di warê îndûstriyê de %9; di karê îndûstriya avahiyan de %6.

Li tevahiya Swêdê, bi giştî seftî %33 di destê jinan de û %66 jî di destê mîran de ye.



# Zimanzan û ronakbîrê kurd Dê Divê em toza li ser zimanê



Mirovê bixwaze hebûna xwe di hebûna zimanê xwe de bipelîne, pêdivî ye ku hinekî xwe biwestîne, berî ku gilî û gazinan ji zimanê xwe bike. Reng e, ew lawaziya zimên di wergerandinê de berçav bibe, lê di afirandina nivîsaran de, zeviyên zimên li ber nivîskarên zîrek vekirî ne.

*Ji nav germiya helbestan û hestên tenik ên dilekî bi agirê şîr rewandî, heta lêkolîn û xepirandina zimên û pêşketina aloziyên zimên... qonaxeke ne hêsan e, gelo çima ev guhartin?*

Di baweriyê min de helbest mîna xewnên şevan in. Dema mirov serê xwe dispêre tamara xewê nizane, ku ewê tu xewnan bibîne, yan nebîne. Xewn xweber tîn, xweber jî diçin. Helbesta helbest jî wekî xewnê ye, bêyî covan û agahdarî tê û bêyî sozdan û xatirxwestin jî diçe.

Dem ku hewesa helbestê di serê helbestvanekî de digere, wekî bayê ber tavê, xwe diavêje can û derûnê wî û hesteke nependî di xwîna wî de hişyar dike, wî ser û bin tev dide û wî dixwe tengavîyeke derûnî yê bêtenahî. Wê çaxê dilê mirovê helbestvan, dibe wekî tendûreke sincirî û pêlên rivînê di reh û damarên wî de hiltên û datên. Ev ezmûna derûnî ya ku helbestvan tê

re derbas dibe, ew bi xwe rûdan û berjenga-zayîna afirandineke helbestî ye.

Hingê, helbestvan, bi wê hesta xwe ya tenik û bi ramanên xwe yên pêjînkari li rijandina firmêskeke (hêstir) germ û belavkirina dûkeleke tîndar digere. Li diyarkirina razekî veşartî digere. Û hingê dilê givaştî sar dike. Wê çaxê tenê jî, ew helbest şûna kenekî şêr, giriyekî bi şewat digire û dibe egera bêhnfirehiya giyanêke zivêr û westiyayî.

Ev helbesta ku bêyî doz û berger tê û bêyî xatir û soz diçe ji mêj ve li min nebûye mêvan. Nebûye xewneke xweber û serdana pênûsa min ji mêj ve nekiriye. "Li ber dergêhen Lales" û vir de, min gelek carî xwestiye, ez wê helbesta ku çavên min lê digerin, binivîsim, min gelek rûpel reş kirin, gelek pêl jî min çirandin û sotin... Û ew helbest nehat. Erê ne min ew helbest nivîsî ne jî min li ser kaxezekê li Sûriya-

yê ew xwend..!

Reng e (ihtîmal e) ku ez bi xwe, ne helbestvan bim. Reng e ku ew kanîkên di dilê ciwanîyê de derbûbin ziwa bûne, miçiqîne. Û reng e jî, ku ev pîrbûna helbest û helbestvanên di civaka me de, bandoreke berevajî li min kiriye û di bin vê akamê de jî, min berê pênûsa xwe bi aliyê zimên û aloziyên wî ve zivirandibe.

Egera nenivîsîna helbestê li nik min çî be jî, herî ez ne dûrî rojeva helbestê û jîngeha wê me.

*Zimanê kurdî wekî "Keskesor"ê ye, ne rengê xwerû ye, zarava gelek in û her zaravayek rola zimanekî bi serê xwe dilîze û her yek cudayî yê din bejna xwe ava dike, gelo tu pêşniyazên we der barê nêzikirina van zaravayan de hene?*

Li gorî têngîhîştina min, zimanê kurdî li ser pênc şewazaran (zaravayan) par ve dibe: Kurmancî, soranî (kurmançiya jêrin), kirmanckî (zazakî), hewramî û goranî. Di bin sîwana her şewazarekî serekî de jî, çend şewazarine biçûk peyda dibin.

Ji wan şewazaran, kurmancî û soranî bûne wekî zimanê nivîsînê. Yê dîtir piraniya bikaranîna wan devokî ye. Helbet, her şewazarek di kurdî de gencineyêke mişt kelepur û rewşenbîriya gelêrî ye. Ji ber vê girîngiyê jî, pêdivî ye, em wan şewazaran di ser guhên xwe re neavêjin.

Aloziya yekbûna van şewazaran yan jî nêzîkbûna wan, ne karekî hêsan e. Ev kar bi çalakiyên mirovekî, yan dezgehekê jî, tu caran pêk nayê. Rewşa kurd û Kurdistanê ya îro, astenga herî aloz e, beramberî her xebata ku di vî warî de dibe, yan jî bibe, gelê kurd, bi vê rewşa xwe ya bindest û perîşan, nikare biryarên wisan bingehîn û girîng bigire; û heger xwest ku bigire jî, nikare biryarên xwe bibe serî.

Bila em xweş zanibin, ku yekîtiya kurdan bi yekîtiya zimanê wan ê neteweyî saz dibe û yekîtiya zimên jî bi azadiya wan saz dibe. Û azadiya wan jî, bi yekîtiya wan pêk tê.

Nexwe, yekîtiya zimanê me bi azadiya me ve girêdayî ye û azadiya me jî bi yekîtiya me ve girêdayî ye. Ji ber vê rastiye jî, her şewazarekî kurdî bejna xwe bi tenhayî ava dike. Lê ev avakirina tenhayî bêyî ku em têngîyêkê, yan şeweyekî girêdarê di navbera van şewazaran de peyda bikin, ma ew dê çeperan di nav me de û di navbera şewazarên de jî, kûrtir û firehtir nekin gelo?!

Ji bo dûrxistina vê metirsiyê (xeter) û ji bo nêzikirina şewazaran jî, pêşniyazên min ev in:

a- Damezrandina komel, dezgeh û înstîtûyên zimên û rewşenbîriyê li welêt û derveyî welêt û li gorî karîne gerek endamtiya van dezgehan jî zanyarên her şewezarî bin.

b- Berhevkirin û amadekirina ferhengan ji her şewezarekî serekî, bi şeweyekî ku ferheng bi şewezarekî serbixwe, beramberî şewezarekî dîtir be.

c- Di nivîsînê de, ku peyvek di şewezarekî de peyda nebe, gerek jî şewezarekî kurdî yî dîtir bikar bê, ne jî zimanekî biyan.

ç- Guhdarkirina êzge (radyo) û temaşekirina televîzyonên kurdî, li welêt û derveyî welêt. MED-TV bo nimûne.

d- Hewldana rewşenbîr û zanyarên her şewezarekî bo fêrbûna hindêk şewezarekî dîtir bi baweriyê min, rawestana li ser van xalên jorin û bikaranîna wan li gorî karîne dê nêzikahiyekê di navbera şewezarên gelê me de peyda bike.

*Niha karê we yê ku hûn dikin tiştêkî akademîk xuya dike, lê ne di çarçova tu akademîsyenî de, tenê nêrîn û pêşniyazên şexsî ne. Di nêrîna we de, wê ev kar ne berfirehtir be heger di bin siya Înstîtuyekê de be angû; hûn bîr û baweriyên xwe tevli bîr û baweriyên zimanzanên din bikin û hemû di yek sazî û heyeteke lêkolînan de bixebitin?*

Çi kar û xebata hevparî û komeleyî ku bête kirin nemaze di warê zimên de, dê ji kar û xebata kesaniya yekta, çêtir û sêztir be. Ev rast e. Û baweriyê min jî, heta dawiyê bi vê nêrîne tê. Lê ka em çî bikin?! Li Sûriyeyê destên me kurt in û li derveyî Sûriyeyê jî, em dûrî wan çalakiyên tevayî ne. Ma em di xewna hezarsalî de bimînin baş e. Yan jî em li gorî zanîna xwe bizavekê di warê zimanê xwe de bikin baş e?! Min negotiyê, tiştên ez di zimên de dinivîsim, biryarên vebir in (bêveger in) Bila pêşniyaz bin. Çi pê tê?!

Ma tiştên ku C. Bedirxan, K. Bedirxan û yên dîtir nivîsîne, heta dawiyê rast û durist in?! Na! Lê ew nivîsîn bi bîngeha sazkirina gelek rêzan û raweyên zimên. Ez hêvîdar im ku dê derfeta xebateke dezgehî, di warê zimên de bi destê min bikeve.

*Di vê gera we ya di nav deşt û newalên zimanê kurdî de, we ev ziman çawa dît? Gelo ew dikare bibe zimanekî ku vê demê (sedsala bîstan û pişt re bîst û yekan) di hembêza peyvên xwe de bihewîne.*

Haya te ji rewşa zimanê erebî ya beriya misilmantiyê, xweş heye. Ç-



# Am Ebdulfettah Kurdî dawesîn

wan perîşan bû. Piştî Quran û Hedîsan, piştî kar û xebatên 1400 salî di ber zimanê erebî de jî tu xweş dizanî ew gihiştîye çî qonaxê. Wisan jî dîroka zimanê tirkî û yê dîtir jî. Lê, zimanê kurdî, yê ku ew qas sal in bêyî nivîsîn maye, ew qas sal in şerê wî bûye û hê jî di himbêza çiyayên xwe de, xwe li dijî talankirin û windakirinê parastîye, tu bi çî rewşê wî dinirxînî?!

Zimanê kurdî zimanekî jîndar e. Bi şewezarên xwe têr e. Bi peyvên xwe zengîn e, bi pergala û rêzanên xwe saz û hevgerî ye. Tenê derfet jî bo pêşketina wî nehatiye. Niha jî ev bend û merc jî me tene xwestin. Ez di wê baweriyê de me, ku zimanê kurdî jî zimanê gelek dewletan sazîr û firehtir e. Kêmasiya wî ya îro kêmasiya me ye, ne kêmasiya zimanê me ye.

Zimanê kurdî jî rêza zimanên lêkdayî (hevbend) e. Ango, dariştina peyvên nûjen, di riya hevgerîna bêjeyan de pêk tê. Ev jî rêbazeke herî hêsan e jî bo peydakirina peyvên, nemaze, peyvên şaristaniya hevdemî.

*Pir nivîskar hene dibêjin; zimanê kurdî têra hestên me nake, em mecbûr in bi zimanên din binivîsin, hûn vê yekê çawa dinirxînin?*

■ Beriya niha, me bi kurtî rewşa zimanê kurdî berçav kir û me got zimanê kurdî di bingeha avahiya xwe de ne kêmtî çî zimanên dîtir e. Lê ew avahiya têr û tund, di bin toza hezar salan de maye. Pêwîst e ku ew toz jî ser bête dawesandin û jî nû ve bête vejandin.

Mirovê ku bixwaze hebûna xwe di hebûna zimanê xwe de bipelîne, berî ku zimên rexne bike, pêdivî ye ku hindêkî xwe biwêstîne. Reng e ew lawaziya zimên di wergerandinê de berçav bibe, lê di afirandina nivîsaran de, zeviyên zimên li ber nivîskarên zîrek vekirî ne. Û pîrbûna şewezarên kurdî jî, gelek çavkanîkên gotin û bêjeyan didin destên wan nivîskarên.

Heger îro bi behaneya tengiya zimanê kurdî hinek nivîskarên kurd, berê xwe didin zimanên biyan û bi wan dinivîsin, ez xweş bawer im, ku piştî deh salan, dê bi nêrîneke dîtir li vî zimanî bête nihêrîn. Em li ser bergeşa (sifra) zimanên biyanan hatine perwerdekirin, êdî em naxwazin xwe biwestînin û xwe bi zimanê xwe rawestînin û perwerde bikin û kêmasî jî berê ya me ye, ne ya zimanê me ye. Erê... a rast ev e...!

*Hin kes hene rexneyan li nivîsên we dikin û dibêjin; "Mamoste Deham xwe dispêre zimanê erebî û jî bo ku zimanekî kurdî yî bi rêk û pêk ava bike, ev rexne bersiveke zanîstî û cidî dixwaze,*

*em ji li hêviyê ne!?"*

■ Jixwe nexweşiya me kurdan ev e. Em nikarin rexne û têbîniyên xwe bi şeweyekî rasteder û beramberî hev, jî hev re bibêjin. Em têbîniyên xwe, li paş hev dikin gindorê berfê û bi ser hev de digindirînin.

Ma ne rastir bû, ku ev têbîniyên di koverekê de bihata nivîsin, yan jî di rûniştinekê de, bi devokî bihata gotin?! Hingê, me dê bi hev re, diyalogêke rêzîmanî li dar bixista û me dê bi hev re jî, destên xwe danîna ser gelek birînan. Dîsa ez sipasiya te bo vê agahdariyê dikim. Lê mixabin, ev têbîniya ku te guhastiya guhên min, bêyî minak û nîşankirin û bi şeweyekî gelemperî hatiye. Xwezî te di têbîniya xwe de bigota, te ev mijara kurdî, li ser rêbaz û rêpîvîna vê mijara erebî saz kiriye. Paşê te "bersiveke zanîstî û cidî" jî min bixwesta. Hingê, min ê li gorî-zanîna xwe, bersiva pîrsa te bida.

Tiştê ez zanim, di pirtûka, "Hindek aloziyên zimanê kurdî" de, mijara 'Hevoka navdar' cihê gumana pîrsa te ye. Ji ber ku zimanê kurdî, jî gruba zimanê Hind-Ewrûpî ye. Hevoka navdar di wan zimanan de nîn e. Gerek ew hevok li gorî pîvanê, di kurdî de jî tune be. Lê hebûna hevoka navdar di zimanê erebî de, cihê gumana ye ku hebûna wê di kurdî de lêpîvanek e, ne hebûneke resen e?!

Heger gumana "... xwe dispêre zimanê erebî jî bo zimanekî kurdî bi rêk û pêk ava bike", jî vir hatibe, jixwe em gihiştin mala dawetê, yan na..., dê her gotin di vî warî de bêhûde û berbad be...!

Dixwazim bibêjim, pîvana mijarekê li mijarekê, yan zimanekî li zimanekî, bêyî gotûbêjê jî hêla danganî (fonetîk) û ravezimaniyê (morfolojiyê) ve ew pîvan, heke rast be jî, dê durrî rêbazeke zanîstî ya hûrbîn be. Û dê ne cihê bawermendiyê be jî.

Şewazê vekolîna min di gêra zimanê kurdî de ew e, ku ez gotin û hevokan li ber xwe radixim, wan hevber dikim û têkiliyên danganî û ravezimaniyan di navbera wan de dipelînim. Paşê ez hêmanên pîvanokan di navbera wan de bi sînor dikim û bi şeweyekî rêpîvan, ez rêzanên zimên jî wan têkiliyan saz dikim, ne ku ez xwe dispêrim, zimanê dîtir û di bin bandora wan de encamên vekolînên xwe saz dikim.

Her zimanek taybetiyên wî hene. Û bi wan taybetiyan jî zimanên dîtir nêvnas dibe. Dibe ku di gelek mijaran de, zimanê kurdî ne li gorî pergala zimanên grûba xwe hatiye û di hindêk mijaran de jî, wekî raweyên zimanên ne jî grûba xwe hatiye.

Ev jî, taybetiya zimanê kurdî ya re-



Bila em xweş zanibin, ku yekîtiya kurdan bi yekîtiya zimanê wan ê neteweyî saz dibe û yekîtiya zimên jî bi azadiya wan saz dibe. Û azadiya wan jî, bi yekîtiya wan pêk tê. Me bi kurfî rewşa zimanê kurdî berçav kir û me got zimanê kurdî di bingeha avahiya xwe de ne kêmtî çî zimanên dîtir e.

sen berbiçav dike.

Ne C. Bedirxan û ne K. Bedirxan û ne jî R. Kurd, di rêzimanên xwe de çel rewşa çawanî (hal) kiriye. Ma ku em bibêjin, ev rewş di zimanê kurdî de heye.

"Memo pêxwas çûye malê", gelo durist e bê gotin, me ev mijar jî zimanê erebî aniye??!

Çiroka hevoka navdar di zimanê kurdî de, bi pênasiya (im, î, e, in,) ve girêdayî ye. Heger ev bêje, paşkokên

kesane (paşgir) bin, hingê dê hevoka navdar di kurdî de hebe. Lê heger ew lêker bin, hingê dê hevoka navdar di kurdî de tune be. Ev e pîvan, ne 'gruba' zimanan e. Ev mijar jî di nav zimanzanan de hê pênasiya xwe ya dawî negirtiye. Her kesî nêrîna xwe bi şeweyekî nivîsiye. Û hê dergehên zanariyê nehatine girtin û tu caran jî na-be ku rojekê, bêne girtin.



# Destegulek ji zaravayên kurdî

## WERE

Werim`pîrim û bimgir bawêş katê  
Were amêzit bike landîk bom  
Were ey serçawe şadî û xem  
Hawdemî yek û le naw yek cama  
roj eger çi bextewer û tenya ye  
şew be nawbang û qalay merdan e  
Le pena yek gul û dirk wer dekewin  
hawdemî şaxî çir e awî zula  
tuş û şîrîn ke delên meyxos e  
Xoş û naxwoşî ke lêkî girêdey  
hawdemî ahîn ney û teli keman  
Ew demey koçî merg dête siwem  
de were destke milim ta mawim  
ta temen derwe berew çolî neman  
ta berew gencî wegerem satê  
ta le bîrim weçê bo to xom  
Ba weku mey şîrîn û tal bo yek dem  
Can û leş wet wê le ser encama  
gêjî wêjîngî xewalû ye şewî lê daye.  
çün le tarîkiye estêre ciwane.  
besteyek in le demê derdikewin  
boye dilrûne wekû gewherî al  
wekû pirekek gemey pê xoş e  
nexşî serberd esirincî lêdey  
Boye girodeyî melbendî seman  
be peroşî bitewem û netewem  
Ba webûjê hêz û gurî hengawim  
Ba gurî şadî bizey bêtê be akarî zeman  
ALAN RÛBAR

## QQRE

We diyar xorawabûnekî dî  
heltirûşkawim  
Liqê tirûskeyem le ser girfanî  
endêsem nawê  
Dem nadem tawebarenê dadeka  
Nilofera pemeyiyekanim lê kurij  
daketewe,  
Reng e ta lêwim bo maçê debizwê...  
Ya asoyê debexşime çawa mandûyekan  
Komelê estêre wezig biden!  
Nazanim ne destûrê tazem pê ye  
Bi jiwan û jîyan!?  
Ne rûbarî ramûsanê ramdemalê?  
Dey deba em êwareyêş dabê..  
Belke çirabaranê le xoyim bigirê û  
Niloferekanim dayisênê...  
Ta minîş binûştêmwewe ser nemamekanî  
birkirdinewem;  
Ya yasayê bê rêsa bo maç bihonmewe!  
Ya puxte xom  
Be esrînî çawe birsiyekan  
bişomewe.  
DARA EHMED/ TAHRAN

## PARTIYA KARKERAN

Ti xwe zanî ey Kurdistan!  
Ti xeyal ma (de) yi şev û roa,  
Ti xeyalan xwe me de ma  
Ti hey ma vîr de şev û roc  
  
Ti şîrî bacaran, meydanan  
Ma kişên erzênî zindanan  
Hesir çiman mayî (dîya) şehîdan  
Ti hey ma vîr (bîr) de şev û roc  
Deştên dûzî doşêk mayî  
Koyên berzî balîşnê (balgih) mayî  
asmîn û howr (ewr) lehayf mayî



Ti hey ma vîr de şev û roc

Wext ameyo kot halan gaman  
Hûn çiman ma ra biyo haram  
Bêkesê dayê sê kerin  
Ti hey ma vîr de şev û roc

Heps û zindan wendê ma wo  
îşkence cê (cihê) vey wî ma wo  
Guwinê (xwînê) ma biya dere yê la wo  
Ti hey ma vîr de şev û roc

## KURDISTAN

Li Kurdistan ko (çiya) yî mêrg î  
Partiya Karker ordî û cergî  
Pikte visto (ketin) arebî, acemî  
Ni lîrî Cengîz û vergî(gurî)

Li Kurdistan vaş kenger o  
Şar vica wo aşm û rocan sero  
Yun in qoricî û hêr o  
Xwe ruweto (firotin) ardan û

şekero

Dîn îslamê dîn û raşt o  
Quran ji biratî waşt o  
Asrî saadet ra pê  
Tirkan û areban û aceman newaşt o

Di şex û mela yî welatî  
Hêf (carek) biyêrên (werin) ser no

şertatî

Zilm ko areban, aceman,

tirkan kerd

Resulullah kum ca vato

Axa û begên ma hêy hûn da  
Çim şexan û malan ma ho nûn da  
Ma Kênê û xort kot in koyan (çiyayan)  
Derdê nezanan mend mi gûn da  
PALOYIC

## EZ TE NATERIKÎNIM

Heger ez zanibim  
Wê çivîk û berxik  
ji min bixeyidin jî,  
û wê nêrgîs û nesrîn  
emîrquî û kezbreşî bibin jî  
ez te naterikînim.

Heger ez zanibim  
wê dengbêj kor û lal bibin  
û wê bi çola kevin jî.  
û ez dê ji behra barana  
demsala ya nuhbarî  
mehrûm bibim jî  
ez te naterikînim

Heger ez zanibim  
ez dê ji vir ve û şûn de  
bêberbang bijîm jî,  
û bi hesreta nivîsandina helbestan  
bişewitim jî  
ez te naterikînim.

Heger ez zanibim  
Wê temama şevên min yê bêdawî  
wê bi kabûsên mirovaxwar re derbas  
bin jî  
û wê diya min şîrê xwe yê

bûkanî li min heram bike jî,  
ez te naterikînim.

Heger ez zanibim  
ez û prensîbên xwe  
em dê bibin dijminê hev û du yên  
heya roja qiyametê jî  
ez te naterikînim

Heger ez zanibim  
ez dê bêm kuştin  
û wê meytê min  
li kûçên bêhurmet bimîne  
û wê kûçik goştê meytê min bixwin jî  
ez te naterikînim Kurdistan  
RÊNAS JIYAN

## SÎHÎRBAZEKÎ

### KERDEN

"Ma xakî rahra be nezer kîmya kûnîm  
Her derdra begûşe- î çeşmî deva kûnîm"

Do  
Di destê min de ferhengeke zebanê  
farisî hebû  
Dema min tê de gotina "Sîhîrbazekî  
kerden" dît,

Sê tişt ketine bîra min.  
Yek Fîrdewsî ku b' devê Rustem jî  
Efrasiyab re

Dibêje:  
Sêrbazê bêoxir  
Ya dudo gomlekê bi tilsimê Qesra  
Topkapî

û sisê jî Harût û Marût'eg  
Di zindanê Babilê de ne  
Yek jî Şehnama Fîrdewsî  
ya din jî nepeniya tilsim  
û yek jî ji nameya dawîn a ezman.

## GAUGAMELA

"Bi namedê Xalîqê alemlî"

Gaugamela  
Ey awa çemanay qet nêvindenaw  
Acêr vazdena  
O ey tarîx, ey wext, ey belgîro  
bê rincanî vazdeno

Ey VZ 612 de Nînova wag ma kena şa  
û asûriyan xerqê derd û kulan kena  
ey badê deşt da Îssosî ya VZ 333 yî  
Deştê Gaugamela wa Vz 331 yî

Arbeles  
Babil  
Ekbatana  
Sus  
Îsfahan û Perpalîs  
Hêdî, hêdî zef hêdî ez di miyandê  
mezeldê tarîxî de

geyrawa, şewa bîne...  
Û min tarîx ra silamî ardî qabê Ariyan, qabê  
kurdan.

HACÎ QADIRÊ PASÛRÎ



Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● 13.12.1997 Şemî: Konsera Koma Agirê Jîyan, saet: 14:00

Konsera Hozan Leman, saet: 17:30

Yekdiya Malbatên Mezopotamya: Ji xwarinên kurdî çend minak.

Sohbet: Murathan Mungan, saet: 17:30

Murathan Mungan

Di sala 1955'an de li Stenbolê hatiye dinyayê. Pirtûka wî ya yekemîn "Mahmut û Yezîda" ye. Di nav pirtûkên wî yên herî navdar de "Sehtiyar", "Ceng Hikayelen", "Kirk Oda" hene. Pirtûkeke wî ya bi navê "Rojhilata dilê min" li kurdî jî hatiye wergerandin.

## CALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li NÇM'ya İzmirê

● 13.12.1997 Şemî: Şanoya bi navê Gûrî, saet: 18:00

● 17.12.1997 Çarşem: Film: "Faşizma Asayî", derhêner: Michalî Romm, saet: 18:00

● 19.12.1997 În: Panel: Mehabad, (Seyda) Mele Îsmet, (seyda) Mele Reşîd, saet: 18:00

Li BEKSAV'ê

● 13.12.1997 Şemî: Sohbet: Binpêkirin û sinca mafên mirovan, beşdar: Ali Ocak (ÎCAD), İsmail Sarioğlu (İHD), pêşkeşvan: Av. Metin Kozan.

## Bîrdoza serdestan û jiyana mirovên reben

# 'Ağır Roman'

Her çiqas destpêka filmê "Ağır Roman" ji aliyê naverokê ve qels û lawaz be jî, em dikarin bibêjin ku ji aliyê muzîk, deng û dublajê ve bi serketî ye.

Em dikarin bibêjin ev ne cara yekemîn e ku li Dolapdereyê, li Tarlabasıyê û li cihê wekî van deran, ango cih û warê feqîr û belengazan film tene kişandin. Sedema kişandina filman li cihên bi vî rengî, gelo ji belengaziya kesên li wir dijîn an jî ji ber rastiya jiyana bi xwe ye? Balkêş e ku di van demên dawî de gelek film li "Getto" yên wisa tene kişandin. Her wekî "Eşkiya", "Hamam", "Masumiyet" û vêga jî "Ağır Roman". Ev film ji pirtûka Metin Kaçan a bi heman navî hatiye wergirtin.

Her çiqas destpêka film ji aliyê naverokê ve qels û lawaz be jî, em dikarin bibêjin ku ji aliyê muzîk, deng û dublajê ve bi serketî ye. Di herikîna filmê de, mijarên cihêreng derdikevin pêş û ev yek jî temaşevanan zêde dixê bin bandora xwe. Lewre film bi finaleke zêde hestiyar diqede. Di film de Tîna (Müjde Ar) bedena xwe difiroşe. Her çiqas ev jiyana, ne bi dilê Tîna be jî, ji bêderfetiye vî karî dike. Müjde Ar, ji ber tecrûbeyê salan bi ya listikvanîyê bi rastî jî rola xwe baş pêk tîne. Salih (Okan Bayülgen) xortekî jî taxê ye. Salih, pêşî jiyaneke ji rezê didomîne. Lê ji ber dijwariyên jiyane, di demeke kurt de bi evîn, kuştin û rastiya jiyane re rû bi rû dimîne û her tim li hemberî neheqiyê derdikeve. Reîs (Mustafa Uğurlu) bi rastî jî gelek tiştan tîne bîra mirov, lê em dikarin bibêjin bê çawa mirov ji hêla sîstemê ve tê bikaranîn û çawa sîstem mirovên wisa tercîh dike!. Reîs, quweta wî bi kê bigihêje wî/wê dukuje. Ji ber ku




hiqûq jî ew bi xwe ye. Kesên li hemberî neheqîya wî derdikevin, bi pêşniyaza Reîs ji hêla polîsan ve tene binçavkirin û îşkenceyên dijwar dibînin. Lewre jî mirov tev bêbawerî ne. Çend kesên ku dixwazin wan kesan bi rêxistin bikin jî, ji aliyê şerîyê taxê ve nayên hesabandin. Ji-yaneke bi tirs, xumam tê dîtin.

Ji bo dîmenên sala 1970'yî xweş bîn xuyakirin 7 hunermend û 12 pispor xebitîne. Muzîk ji aliyê hunermend Atilla Özdemiroğlu hatiye amadekirin. Derhêner Mustafa Altıoklar wekî tê zanîn filmê "İstanbul Kanatları Altında" jî anîbû ber temaşevanan. Her çiqas kêmasiyên derhêner hebin jî, di vî filmê xwe de bi serketî ye.

ŞEXMÛS ÖNAL

## TÎŞK

# Na-kişa rînome



LERZAN JANDÎL

Nivîsê raştiya dîroke yo verên de ma vatî bî: "Se ke êno zanyene jî na sarewedayene (sarewedayena leşkeriya tirkane ke Osmaniyan ra vêşerî mendî) virêndiye hemverê şenikanê Tirkiye, zê armeniyana, rûman, kurdan amê kerdene."

No teşbîtêde raşt o. Yanê zamano ke vanê tirkane cengê xo yê şarîtiyê (millî mûcadele) kerdo, o zaman de hemverê kurdan jî ceng kerdo. 1919 tirkane hem hemverê qewetanê girsan û bado jî hemverê yewnana ceng kerdene û hem jî hemverê kurdan ceng kerdene kewtêne hardê kurdan.

Na ca yew paradoks esto. Hardê kurdan bin destê Osmaniyan de bî. Na raşt a. La belê împaratoriya Osmaniyan cengê dinyayê jewnê ra tepiya rijiyê. Yanê dewletêde niyanêne nêmede. Sebetake na dewletê nêmendî bî teorîk jî hardê kurdan "azad" biyêne. Çimke dewleta koledarê rijiyay bî. La belê realîte hênî niya. Împaratoriye rijiya, hama leşkerê împaratoriya vêşeriye hardê kurdan de jî esta. Na leşkeriye sebeta rêyna îşgalkerdana hardê kurdan xebetîna. Ma na se bena? Yanî dewlete çîna, la belê leşkeriya dewletake çîna, seba îlgalkerdana hardê şarêde bînî ceng kena!

Na ca de çîyo bîno înteressant jî o wo, ke zafêriya serleşkeriya na leşkeriya vêşeriye jî endamê İttihat Terakkî yê. Yanê endamê partiya ke biyê sebebê tedêşiyana Osmaniyan û endamê partiya ke ceng kerdo vîndî û êndî hiqûqî niya wê.

Na êna çî mana? Na êna a manaya ke, partî û leşkeriya almanan cengê dinyayê ll'îne ra dime, şoro wunciya polonya îşgal bikero.

Ma almanan ke çiyêde niyanên bikerdene, no biyêne legîtîm (rewa/meşrû) û hiqûqî? Nê. Ma tirkî ke naye bikerê, qeyî ê dînan beno legîtîm û huquqî? Bingeyê persa cengê tirkane û kurdan na ca de ra. Hetanî ke çewabê na persê mero dayene, na mesela mero zelalkerdene, karekterê cengê tirkane jî zelal nêbeno.

Nayê ra ciya persêde bîne esta.

Se beno, ke yew îşgalêde welatêde bînî yo ke teorîk 'azad o' êno kerdene, beno cengê azadiyê? Yan jî se beno, ke yew cengo ke hetê leşkeriya dewletêde çînebiyeyê ra êno kerden, bono cengê azadiyê?

Nê persî hetê de, la belê tirkane ceng nêkerdo. Cengo ke amo kerdene, hemverê yewnanan o. Dîroke de jî zaf eşkera wo, ke yewnanî ebi teşwîqê İngilîzan kewtî hardê împaratoriye û wunciya ebi waştana İngilîzan û împeryalîstanê bînan û tene jî ebi sarewerdardayena lokalan hardê împaratoriye ra vejîyayî.

Ma kam pêramend, ke tirkî hemverê dînan ceng bikere? Raştiye de teyan kurdî. Ma ê jî koledar nêbî. Statûkoyê dînan zê "azadiyêde" relatîve bî.

Ma na realîte de se beno, ke cengê tirkane beno cengê azadiyê? Ez wazena, ke persa pêyniya nivîsê xo yê raştiya dîroke li rêyna bikerê:

Nê sebebî pêro seba almanan nêbenê, la belê Tirkiye benê sebebê cengê rizgariyê!

Naye de yew çewtiye esta.



**Nursel Ince**  
(Sarya)

Ger ez çilkek ava kelê bûma  
Minê xwe berda  
ser birînên Hebûn  
li gundê Sinê

Ger ez zîpika biharê bûma  
minê reng û bêhn  
bida kulîkên  
Gabarê

Hevala Sarya, te li hemberî hovan di vî warî de xebat kir, di dawiyê de tu çuyî li ser çiyayên welêt şehîd ketî, di şexsê te de em hemû şehîdên doza azadiyê bi bîr tînin! Em te tu car jî bîr nakin. Doza te doza me ye!

Ger ez çilkek şîr bûma  
Minê xwe berda elba  
bêrivan û bêrtiyan  
ji bo Bêrîtanê

Ger ez hubir bûma,  
minê xwe bikara pênuşa  
Şenol, Gurbet û Sarya  
û hemî rojnamevanan

(G. Dêrsilê)

**Xebatkarên rojnameya**  
**Azadiya Welat**



# Mencola qîza Yaz Begê (2)

Xiço got:

– Xanima min wele ez nikarim bi-dime te gustîla Mencola Yaz Begê. Ûsif Begê wê min bikuje, wê te ji, kur û kem bike û bişîne ser mala bavê te.

Jina Ûsif Begê ya navî çû pêşiyê, got:

– Xiço, Ez ketime bextê te û Xwedê. Ez dizanim te aniye gustîla Mencola Yaz Begê. Tu bide min gustîla Mencola Yaz Begê, ezê te têr bikim, bi malê dinê.

Xiço dibêje:

– Xanima min wele ez nikarim bi-dime te gustîla Mencola Yaz Begê. Ku ez bidime te gustîla Mencola Yaz Begê, Ûsif Beg wê min bikuje, te ji kûr û kem bike û bişîne ser mala bavê te.

Dawiyê jina Ûsif Begê ya biçûk çû pêşiyê û got:

– Ez ketime bextê te û Xwedê. Ez dizanim te aniye gustîla Mencola Yaz Begê. Tu bide min gustîla Mencola Yaz Begê, ezê te têr bikim, bi malê dinê. Ezê te bikim şîrîkê xwe û doşekê û nivînê.

Xiço li vê fikrê xwe diguhêze, gustîla Mencola Yaz Begê dide jina Ûsif Begê ya biçûk, dibe şîrîkê wî û nivîn û doşekê.

Çend roj derbas dibin, Xiço diçe dîwana Ûsif Begê. Ûsif Beg jê dipirse:

– Xiço inşela te aniye gustîla Mencola Yaz Begê.

Xiço dibêje:

*Mîrê min, mîrê min, mîrê min...  
Siba du sibe ye, siba du sibe ye  
Taveke baranê tê ye tevî bê ye  
Bejna Mencola mîna qelaxa rêxê ye  
Pozê wê mîna pozê hirçê ye  
Pirçe serê wê binanî pirça dêlikê ye  
Ew ne layiqî Ûsif Begê mîrê Kela  
Wanê ye.*

Dema wisa dibêje, Ûsif Beg bersiva xwe digire, xwe ker dike. Demek derbas dibe.

Bila Xiço û Ûsif Begê bixapîne, em werine ser qiseta Mencolê.

Piştî demekê, Yaz Beg Mencolê dide Erebe kurapê wê. Dixwazin daweta wan bikin. Mencol îzna dawetê nade. Yaz Beg bi keça xwe re xeber dide û Dibêje:

– Tu çima îzna dawetê nadî.

Mencolê dibêje:

– Bavo, min sond xwariye, heyanî Ûsif Begê mîrê Kela Wanê neyê vê derê, ez nadim îzna mahrê.

Yaz Begê dibêje:

– Keça min tu çi layiq dibînî. Bişîne pey Ûsif Begê bila bê.

Mencolê radibe kaxezekê dinivise, dixwe nava zêrê, dide destê xulamêkî, çend zêran jî didê û dibêje:



– Ecele vê mektûbê bibe bide Ûsif Begê mîrê Kela Wanê.

Xulam mektûbê hildide, dikeve terqa rê. Sê roj û sê şev pişt re xwe digihîne Kela Wanê, mektûbê dibe dide destê Ûsif Begê.

Ûsif Beg devê zêrê vedike, bala xwe didê ev mektûba Mencola Yaz Begê ye. Tê de dibêje:

– Bavê min ez dame Erebe kurê apê min, min sond xwariye ez nadim îzna mahrê, hetanî tu neyêyî vê derê.

Ûsif Beg piştî ku mektûbê dixwîne, dişîne pey Xişoyê mirtîbê xwe, tîne dîwanê, ji xulamê xwe re dibêje:

– Bikin kar û tedbîra min û Xiço. Emê herine Çiyayê Sîpanê Xelatê.

Xulam didine Xişo mehîna Delîho-

rê, ji Ûsif Begê re dikişînin bozê çarsalî û tevlê Ûsif Beg bi Xişo ve dikevîne terqa rê. Sî roj û sî şevî dimeşin. Xwe digihînin Çiyayê Sîpanê Xelatê. Bala xwe didinê, govenda giran digere deriyê mala Yaz Begê. Bala xwe didinê ew daweta Mencola Yaz Begê.

Xulam têne pêşiya wan, serê hespê wan digirin, dibêjin:

– Mîrê min kerem bike aliyê dîwanê.

Lê Ûsif Begê naçe aliyê dîwanê, diçe dikeve serê govendê. Govendê hêj li dorekê nazivîrî, Mencola qîza Yaz Begê radibe dikeve destê Ûsif Begê. Mîrê Sîpanê vê yekê qebûl nakin. Radibin ji Ûsif Begê re datînin sifreyê bêbextiyê. Dibêjin:

– Emê Ûsif Begê bikujin, Mencolê bidine Erebe kûr apê wî bi emrê Xwedê. Rûsîyekî Yaz Begê, diçe cem Ûsif Begê, dibêje:

– Mîrê min, kerem bike em herin dîwanê çay û qehwe vexwin. Mencolê diçe cem Ûsif Begê dibêje:

– Ûsif Beg hay ji xwe hebe. Mîrekên Sîpanê ji te re danîne sifra bêbextiyê.

Ûsif Beg govendê berdide, berê xwe dide dîwana Yaz Begê. Di nav hawliyê de mîrekên Sîpanê, êrîşî ser Ûsif Begê dikin. Ûsif Beg bi xençera xwe mîrekî xurt bûye. Lêdixê sî û sê mîrên Sîpanê dîkujê. Mencola qîza Yaz Begê bi destê zorê, hildide tîne. Ûsif Beg, Xişo û Mencol sê roj û sê şev bi rê de tîne, tîne Kela Wanê.

Ûsif Beg bi Mencolê Qîza Yaz Begê daweta xwe dikin. Vê navbeynê de midetek derbas dibe Mencol ji Ûsif Begê dipirse, dibêje:

– Mîr ew gustîla min dabû Xişo, ji te re şandibû kanê ye?

Dema Mencolê bûyerê ji Ûsif Begê re dibêje, Ûsif Beg meseleyê fêhm dike.

Ûsif Beg, gazî Xişo û her sê pîrekê xwe dike, tîne dîwanê. Ji wan dipirse dibêje:

– Ji min re rast bibêjin, te gustîla Mencola Yaz Begê dayê kîjan jina min. Tu bi kê re bûyî şîrîkê xwe û doşekê?

Xişo û her sê jinên Ûsif Begê rastiye ji Ûsif Begê re dibêjin. Ûsif Beg serê Xişo û hersê jinê xwe jê dike. Di dawiyê de wiha dibêje:

*Dilê min, dilê min, dilê min  
Baran barî şil kir cilê min  
Çi carina dernakeve dilê min  
Kula Xişoyê mirtîbê min û her sê jinên min. (Qediya)*



## Keça Kurd Zengê

Pirtûka lêkolîner û dîroknas Cemşîd Bender "Kürt Kızı Zenge" ku berî niha sê çapên wê li Tirkîyeyê bi zimanê tirkî ji hêla Weşanxaneyê Berfin ve hatibû kirin; vêga jî li Stocholmê ji hêla Weşanxaneyê Nûdemê ve bi kurdî hate weşandin. Wergera jî tirkî ji hêla Firat Cewherî û Süleyman Demir ve hatiye kirin.

Di pirtûka bi navê "Keça Zengê" de 16 kurteçirok hene. Ji van 16 kurteçirokan 11 heb ji hêla

Firat Cewherî ve, pênc jî ji hêla romanivîsê kurd Süleyman Demir ve li kurdî hatine wergerandin. Xêza li ser berga pirtûkê ji hêla resamê navdar Rebwar Saîd ku li Swêdê jiyan xwe didomîne, hatiye çêkirin. Belavkirina



vê pirtûkê li Tirkîyeyê ji aliyê Ercan Kîtabevî ve tê kirin. Ji bilî vê kesên ku dixwazin dikarin vê pirtûkê ji Navenda Çanda Mezopotamyayê Şaxa İzmirê jî bi dest bixin. Pirtûk ji 130 rûpelan pêk tê.

Ercan Kîtabevî  
847 sok. No:27/A  
Konak/İzmir

SERWÎSA ÇANDÊ

## Hejmara 57'an a Nûbiharê derket

Mehnameya çandî, hunerî û edebî Nûbihar, piştî hejmara xwe ya 56'an ku beriya demeke kurt derketibû, bêyî ku meh biqede hejmara kovarê ya 57'an jî derket. Ji ber ku kovar di demên dawîn de bi awayekî rêkûpêk di meha xwe de demediket ev hejmar zû derketiye. Rêveberên kovarê dixwazin vê valahiya ku çêbûye, di demeke kurt de bi 4-5 hejmaran dagirin.

Di hejmara nû de, nivîsa sereke ji hêla xwedî û berpirsê karê nivîsaran ê kovarê Süleyman Çevik ve bi sernavê "Kevir li cihê xwe giran e" hatiye nivîsin. Nivîs ji dema osmanîyan heta îro, serboriya daxwaza Tirkîyeyê ya rojavayîbûnê û tîkiliyên bi Bazara Hevpişk, Civata Aborî ya Ewrûpayê re bi zimanekî rexneyî hatiye vegotin. Bi kurtasî ji nivîsa Çevik, bêhna acizbûna ji vê daxwazê difûre. Em dikarin bibêjin ku ramana sereke di hevoka dawîn de ye: "Ewên ku bi hinekên din nîsbet bikin, li cem tu kesî qîmeta wan namîne û li cem kesî nikarin bi şerefa xwe rabin û rûnin jî..."

Dubeytiyên Baba Tahirê Uryan ku ji hêla Sabah Kara ve ji zaravayê lorî hatine wergerandin, di vê hejmarê de jî didomin.

Di nivîsa bi navê "Kurd: Netewê xuda yê heyirî" ya Fehmî Huweydfî de li ser "pirsgirêka gelê kurd" tê rawestî û digel wê jî qala pirsgrêkên


gelên Bosna, Filistin û Pakîstanê tê kirin. Ev nivîs ji hêla Selman Cîhadvan ve ji erebî hatiye wergerandin. Wergereke din jî ji hêla Hayrullah Acar ve hatiye kirin. Acar beşek ji pirtûka navdar ya Migirdîç Margasyon "Taxa gawiran" wergerandiye kurdî.

Li hêla din, serpehatiya R.Karakaya bi sernavê "Hêviya li deşta Sokeyê", Sîdîq Gorîvan bi sernavê "Biharek reş û moran", Abbas Alkan jî bi sernavê "Aqil taca zêrîn e" nivîsar jî bo vê hejmara kovarê nivîsîne.

Nivîsa bi navê "Çavşîr" ji hêla Bîradost, "Îdeke li merqeda Xanî" jî ji hêla Newzat Nurullah ve hatiye nivîsin. Li hêla din biranîneke Salihe Kevirbîrî ya bi sernavê "Xweziya bi birçîbûna welat û ne bi..." di kovarê de cih digire. Her wiha di Nûbiharê de Ferîd Îzol, Bavê Selman, Emirşah Kahraman û Muhammed İqbal bi helbestên xwe cih digirin.

Di vê hejmara nû de nixandî û

danasîna kesên navdar û berhemên nûhatî jî cih girtiye. Bo nimûne, li ser pirtûka Arîf Zêrewan a bi navê "Bingeha rastnivîsîna kurdîyê" E.H. Mihemed nixandînek kiriye. Dîsa




di vê hejmarê de Mele Ehmedê Palo jî ji hêla A. Balî ve hatiye nasandin. Astana Pirtûkan wekî her car jî hêla Ercan Gür ve hatiye amadekirin.

SERWÎSA ÇANDÊ

## Zanist kembera mêjî ye

MEDENÎ FERHO



"Rexne û galegal hêsa ye, ya girîng û zor bi kêrî afirandinê hatin e."

Mirov meymûn e. Mîna Neitzsche dibêje, ev meymûn ber bi xwedayî çû. Kurd, mîna ku Ehmedê Xanî dibêje, bêxwedî û xwedan bûn. Di dawiya sedsala 20'an û destpêka sedsala 21'ê de pêdiviya kurdan bi xwedan hebû. Pir mirovan xwe da pêş. Bijartina xweda ne hêsa ye û moxilê dixwaze. Ne serad û bêjîngê, lê moxilê... Moxil hûr û zîwan û qirêjê bernade, diwejêre. Ji van mirovên ku xwe dane pêş bi piranî bûne zîwan û qesela derdorên. Bedbextiya kurdan ev e ku "Hinek kesên ku nikarin bi kerê dibezine kurtên", (Mîna ku rewşenbîrek li ber kaba mele û keşan rûne û bazbendeke ya 'nasîb' bixwaze, yan jî hêviya xwe bigihîne efsûnbazan).

Dîrok heya îro li ser bingehêkê rûnenîştîye. Ji ber ku dîroknas, bal berdane ser mirovên

mezin û girêdanên jiyanê bi wan ve girêdayî. Napoleon jî li hemberî mirovên zanyar gavên sert û zexim avêtine. Lê, Napoleonê kurdan ku li hemberî nivîskar û zanyar gavên sert û zexim diavêjin, ne tenê bi qam û bejna xwe, bi mêjî û nêrîna xwe jî pir biçûk in. Awaz sist û pûç in. Nikarin bibin cengawerên pêhatî û bûyeran. (Mîna derwêşekî ku bikêrî geşta feqihan jî neyê û pariyê herî mezin bixwaze.)

Li cîhanêkê bêxweda, mirov xweda ye. Lê berî 'gerîla' li Kurdîstanê, mirov ne mirov bû. Pez û dewar pir bûn. Piştî ku 'gerîla' peyda bû, pirtûkên bi navê 'Hey gerîla' derketin holê. Mîna parçebûna atomê bû ev. Hinek mirov jî vê pêşketinê nearam bûn. Sexelî bûn, dilêşî û zikreşî bi wan re peyda bû. Piştî xwedê, text û taca xwe wînda kir. Jiyan mabû li ser 'Tesadûfan'. Heger gotina Will Duront: "Şarîstanî demjiyana di navbera du şîpên qeşayê de ye", ne ku mirov kompleksên xwe bide pêş û xwe di pişta hinek tiştên 'bêdengeyî' de veşêrê. Ev heyecan û sergerdeyî çî ye?

Fizîk girêdayî destûra cîhanê ye. Ji ber ku li dîv hoy û encaman, wê bûyer û pêhatî çêbibin. Wê li dîv vê bûyer û pêhatiyê, bûyer û pêhatiyên din jî pêk werin. Zanist, kembera mêjî ye. Zanistî bi nijandinê dest pê dike. Ji bo nijandinê rewşek bi rêkûpêk pêwîst e. Ev rêkûpêkî di cîhana kakilî de xwedî gotina dawî

ye. Di cîhana gelê kurd de destûr nîn in. Ji ber ku derwêş nikarin destûran li dar bixin.

Pîra Cegerxwîn ku ji ber roma reş direve tê Sêrtê û diçê Bêrtê, bi kêrî nanpêjiyê nedihat, dora tenûrê îdare dikir. Geşta feqihan jî nedida derwêşan. (Derwêş mirîd in, mirîd jî li hesabê miriyan e.)

Kurd, îro nixê zanistî dizanin. Ji ber ku gihane qonaxêke bi nix. Ev nix 'qijle' ye. Gelê bêqijle nikare desthilatiya xwe pêk bîne. Rewşenbîr dema tîkoşînê dikin, baweriyê bi hiş û hişmendîya xwe tînin. Ji ber ku şoreş ne ji hêla rewşenbîran ve, ji hêla komên xelkê ve tîne kirin. Ji bo serdariya komên xelkê jî mîrên çê û dilpola û awazşîqî pêwîst in. Dîrok ne tenê restorasyon e. Ji nû ve de avakirin e. Derwêş nikarin bibin destpêk. Lewra cihê wan li dîv feqihên pey 'seyda' ye.

Şeydîtiya rewşenbîran jî, di pêvajoya meqilka sincirî de ku bi ciwamêrî rahêjin dîvikê wê ye.


Gotina dawî: Malsotî... Yan jî rezbirin... her du gotin malwêranî ne. Berbûtiya perîzade û keşezade jî pirsgrêka navbera rewşenbîr û serdaran çareser nake. Zêw û zêwdar jî vê berbûtiyê napîşkin û komên xelkê kurd, jê sîdewar nabin. Serdar çima xwe bixin nava tomika berjewendiyên kesayetî û nexweşiyên kesan?



# Sê lawên Evdal

**B**erê êvarê, di êmdana mirîşkan de kifş dibe ku dikê mala Evdal winda bûye. Sê lawên wî hene, kesek lê nagere. Di peş de bizina wan winda dibe. Her sê bira li bizinê digerin - nagerin nabînin. Diçin ji bavê xwe re dibêjin: "Bavo bizina me winda bûye." Bavê wan ji wan re dibêje: "Lawên min li dikê xwe bigerin." Her sê bira bi hev re dikenin û diçin. Pişt re mîha wan winda dibe. Dîsa tînan ji bavê xwe re dibêjin: "Bavo îcar mîha me winda bûye" Bavê wan dîsa dibêje: "Lawên min li dikê xwe bigerin." Sê bira dîsa guh nadinê û bi ken radibin, diçin. Ku gayê wan winda dibe, her sê bira bi hev re tînan cem bavê xwe, jê re dibêjin: "Bavo îcar gayê me winda bûye" Bavê wan ji wan re dibêje: "Lawê min li dikê xwe bigerin."

Her sê bira diqehirin û bi hêrs ji bavê xwe re dibêjin: "Bavo bizin, mîh, ga winda bûne tu dibêji: 'Li dikê xwe bigerin'. Bavê wan ji wan re dibêje: "Lawên min, heger ku hûn li dikê xwe bibûna xwedî; bizina we, mîha we û gayê we ji winda nedibûn!"



# Gelo serê wî pê ve bû

**P**ênc heb heval bi hev re diherin diziyê, dikevin malekê. Bi teqereqê xwediyê malê hişyar dibe, dide dûv wan. Her sê direvin, dido xelas dibin, yek tê girtin. Xwediyê malê serê wî jê dike û meytê wî li wir dihêle. Her du hevalên wî bi hev dişewirin, dibêjin hevalê me nehat. Kanî em herin heta cihê ku em ji hev du qetiyên, li hevalê xwe bigerin. Tînan cihê ku ji hev qetiyane. Li wir meyteki li erdê dibînin.

Her du hevalên wî lê dinêrin, wî nas dikin ku hevalê wan e, lê serê wî tuneye. Her du ji hev re dibêjin, gelo êvarê wexta ku bi me re hat serê wî pê ve bû an na? Ji hev dipirsin û her du jî dibêjin: "Nayê bira min." Dikevin nav mitalan; yek ji wan dibêje: "A qenc û rast ew e ku em herin ji pîreka wî sewal bikin, wexta ku bi me re hat serê wî pê ve bû an na." Dixin serê hev du û diçin cem jina hevalê xwe.

Dibêjin: "Xwişkê, êvarê wexta ku zilamê te bi me re hat diziyê, gelo serê wî pê ve bû an na?" Jinik dibêje: "Gelî birayan, ez nikarim derewan li we bikim û rûyê xwe li ber Xwedê reş bikim. Herçî nayê hişê min gelo ka serê wî pê ve bû an na, lê belê wexta ku êvarê şiv dixwar, çenga (erçen) wî diçû û dihat!"

SEYDO BAŞÇI

# Heqê Çêlekê

**Y**ekî fileh û yekî misilman, bi hev re bi rê de diherin. Ewr çêdibin û dibe giregir. Yê fileh ji yê misilman re dibêje:

"Tu zanî ev çi giregir e?" Ê misilman dibêje:

"Erê ez dizanim ev çi giregir e; ewr çêbûye û bûye giregira tawanê dike baran bibare." Ê fileh dibêje:

"Na te pê dernexist." Ê misilman dibêje:

"Lê çi ye?" Ê fileh dibêje:

"Îsayê me çêleka Mihemedê we diziyê, postê wê jê kiriyê û bi xwe re dikişîne, dike xurexur, ma qey te nizanîbû?" Ê misilman mirovekî pir nehs û çavbirçî ye. Jixwe li maneyan digere. Bi berstûka ê file digire û dibêje:

"Madem Îsayê we çêleka Mihemedê me diziyê, kanî heqê çêlekê." Ê fileh dike nake xwe jî destê wî xelas nake û di dawiyê de heqê çêlekê didê.

## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (98) XAÇEPIRSA

Şerh	X	P	Î	Ş	Ê	Î	M
M	M	D	Û	H	S	E	L
A	S	R	Â	L	T	Î	N
A	M	A	D	E	Ê	R	Û
Î	B	A	D	Î	Â	R	A
Î	S	A	Î	D	E	A	V
K	E	R	E	N	A	E	S
R	A	Ê	S	Î	N		

PEYVA VEŞARÎ

Xurçik	Lêborin	Bi erebi kirin	Baxê...	Dem	Avakare
Stiyasetme darek (Wêne)	Hespa mê	Rojek	Baneşane k	Tîpa berî 'u'yê	SSCB'yê
8		1			
Program				Cînavkek	
Serkevîrê kîşîkê		Tipeke kurdi Navê mehekê	Bi kirdkî hat Cînavkek	Bêhn	Sembola azotê
Dixîn stuyê ga		Bi tîrkî 'herî'		Fektyê mêwê	7
Tipek		Roj		Mîrov	
4	Dijberê hîşk	10	Welatek		6
Fosfor	Şuştin		Devokî wan		
Pîle, sewtye	Sira	2	Dengdarê n wan Tipeke dengdar	11	
		Feraqek			
Tîrk		Tipeke kurdi			
Jêhatibûn			Dijberê erê Tipeke dengdar	3	
		5	Pehn, (devokî)		

### Bersiva Xaçepirsa 96'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 keşan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 98'an a Şahnameya sala 1998'an a Özgür Halkê ye.

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsîn û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 96'an 'Mezopotamya da dinlerin doğuşu ve gelişimi' qezenc kirine: Selahattin Sürer/K.Kale, Seyîthan Öz/Stenbol, Adil Elmas/Wan, Şükran Acıbuca/İzmir, Atik Kaya/ Semsür

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12





T.C. JI BO EWLEHIYA SÎNOR WÊ KDP'YIYAN PERWERDE BIKE Û BIKAR BÎNE

BÊRÊ ME ÇIMA  
LI VÎ ALÛYE?  
EW KÛYE?  
ÇIMA BÎ ME RE WISA  
DİPEYIVE?  
ÇIMA...

FF!..  
KERO HUŞ!  
AMADE  
BE..

# May vinîbiyayo

Tom 133 hewtey, yanî 931 rojî viyarto beyntar ra. Ê hema her hewtey weyra yê. Ne dijne/varan, ne çamûr, ne vewrî, ne polîsan... Qet çekî, çewî nişta jîn vindarno, jîn ver vindo.

Qet nêbetilyay, nêtersay... Ana yew eynadey, ana yew rikî reydfî dest pê kerd hetona eyro...

Dewleta TC. çika şî jîn ser, çika îşkence kerd, çika jop kerdî, çika kutikê xwi/ xo no di nigî û çiyer nigî ver bide day... Ney, vengî bi, qet çî nişta jîn vindarno, jin îno çalaki/eylem ra fek veradiyîş do...

May vinî biyayo... May wayîrê derd û kulan. May Hesên Ocakî, may Aysel Malkaçî, may Talat Türkoğlu, may R. Karakoçi, may H. Gülünay, may M. Göktepe.. may ma pêrin...

Ê her hewtê Lîsa da Galatasaray verdê... Her hewtê...

Ezî honî yo weyra yo eyro zî... Mî hefî rojnamevanê Ûlkede Gündem Faruk esto. Ma piya yew kombiyayîş ra yenê. Ma verê şî cay ronîştinê İHD. Eylâ ma tikê erey kewtibî ki çew çinê bî. Ma va de hadê ma şorê mayo hetê.

Ma şî... yew cara dijîni şilpena, tikêy zî serd o...

Ma lîsa verdî yew di tulî finenê. Dorme/ çorşîme di sey hergû roja ronîştîşî, polîsî estî. Ma ra vêşêr hema çew nêameyo. Ez vano: "Nêzon ma rew amey?!" Embaz (Faruk) vano: "Ney, ney înak ko ra esto se yenê.."

Ma money xwî/xo danê dêtê postêxanê de Galasaray ew pawenê. Saet yeno 12.00 di. Verê yew çend rojnamevan yenê. Tîra pey... hah may cefakêş may Hesên Ocakî yena.

Ez şono destê ja. Ez vano. "Dayê ti senîn a, weş a?" Vana: "De weşiya... ti kotî ra yê? Ez vano: "Dayê ez Derbekir/Amed ra yo."

Ma yew, çend qalî/ qîsey kenê, dima cenîya Savaş Buldanî yena, pey ra cenîya Albay Ridvan Özdenî û tîra /inan pey tayna cenî.. Yew bîna miçî kenê, yewîn persenê... Ez yewno ferest veyneyno, hewna şano ja hefî. Ez vano: "Dayê tî zon/ziwanê ma weş zana?" Vana: "Çoxî ûnitmişim, ûnitmişim...



No des serî yo burdayix, hepî ûnitmişix. Xo vîra kerdo, vîra...."

Ez vano: "Eylâ ezî no vîst serrî yo ki wîta yo, bewnî mî xwî vîrî nêkerdo, şîma senî des serrî di xwî/xo vîrî kerd...?"

Vana: "He wîlla... Ma Elezîz/Xarpêt di ronîştî yew wext, zonê zarava ma ferqlî ya... Êslê ma Dersîm ra yo. Ma Nazmîye ra yê..."

Xorîn, xorîn mi ra hewnîyena. Kam çîzano belkî zî lajê ja ancîna kewt ja vîrî. Na zî lajê ja key histê ja ra vejîyâ bi ki...?

Ez vano: "Ez wazeno ki jew roj biro seba Azadiya Welatî şîma di yew roportaj biko." Vengê xwî nêkena, belkî veng nêşîbide, belkî zî hişê ja caynado...

Keyna/ çeyna ja, ja het a. Ez vano: "Ti sey ma zona?" Vana: "Yok, biraz anlıyorum ama, kunuşamıyorum.(Ney, ez tikê fam kena, labelê niştô qalî ko.)"

May vana: "Oyo nêweşo...(Apoy, mêrdê xwî qest kena) xestexone/ nêweşxane di rawkeno. Ez vano: "Qey xeyr o, çî jey esto?" Vana: "Qelbê jey, qelb ra rehetsiz o..."

Beylî ya ki eyro bira bêkeyf a...

Wextê ronîştîşî ame, ma şonê roşenê. Nizda se tenî mêrdim/ison amew. Heme kes yew resmê vinîbiyayo gêno xwî/xo dest ew

roşenê.

Maya Emîna (Ocak) dest di yew dismali bermena, hêrsanê xwî estarena.. Zerrey mi veşeno...

Hêşê mi şano hîre-çiyer serrî ra ver. Ez ay wexto "Welatê Me" di enî sînema sero nûseno... Yew film bî vinîbiyayan di Arjantinî sero. Namey ja, "Dîroka resmî/ Tarîxê resmî" bi. Ina film di bahsê vinîbiyayon û mayan kerdê... Mî ina film sero nîşt bi. Û peynî di zî mi veynda mayandê ma dabi.

"...Ez vano ki ecêba ma zî anasor çî (sey mayan dê arjantîniya resmanê eylan dê xwî bi pêre roşê çalakî...) bikê se, se bêno?... mesela Taksim di, Bakirköy (Meydanê Azadiyan) di, Derbekir/Amed (Berêkoy) di..." (Welatê Me. 5 Adar 1995)

Ew çî tesadûf bi ki mayo yew-di hewtey ra pey destpêkerd bi ronîştîşî... Beyntar a hîndasî wext viyarto. May hema zî roşenê. Ne germ, ne serd, ne çamûr, ne zî yewna çî. Çekî niştô jin vindarno.

Qediyayîş inî nûştî ra dim, Komela Rojnamevanê Hemdem şubeya Marmaraya Başûr xelaya heqê mardiman day Emine Ocakî, namebê mayandê vinîbiyayan.

C. ZERDÛŞT

**WELAT**

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNÎŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX:  
(0 212) 251 90 13

Gerînendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMÎ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê têkiliyên bi gel re  
(Halkla ilişkiler müdürü)  
METİN AKSOY

Berpîrsê Saziye  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.  
BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:  
(Nünerê Giştî yê  
Ewrupayê)

Mahmut Gergerli  
49 871 67 08 15

Brüksel:  
Medenî Ferho  
32 532 721 12 03

Suriye:  
Jana Seyda  
Helim Yüsv

Berlin:  
Silêman Sîdo  
00 49 30 691 6495

Hannover:  
Selim Biçûk  
49 572 18 13 60

Stockholm:  
Robin Rewşen  
46 87 51 05 64

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

Hollanda:  
S. A. Fewzî  
31 104 85 55 43



# Gel hem bêz kir Welat

**R**oja 5'ê berfanbarê li Kadiköya Stenbolê li Salona Sergirtî ya Werzişê ya Caferaga (Caferaga Kapalı Spor Salonu) dest ji bo "Azadiya Welat" rabûn, çepik ji bo "Azadiya Welat" hatin lêxistin û govend ji bo "Azadiya Welat" hate girtin. Şahiya ku ji bo piştgiriya "Azadiya Welat" ji aliyê HADEP'a Kadiköyê ve hate saz kirin, bi beşdariyake mezin û bi ços pêk hat. Ji kesên bi tûrban, heya çepgirên tirkîyeyî gelek kes û derdoren cuda ji bo "Welat" li çepikan xistin. Eywana Caferagayê mişt tiji bû. Di şahiyê de pêşkêşiya tirkî endama "Koma Amed" Serap Sönmez; ya kurdî jî Berpîrsê Karê Nivîsaran ê Azadiya Welat M. Salih Taşkesen kir. Wekî kom û stranbêj jî Koma Azad, Hozan Hogir, Koma Agirê Jiyana, Boğaziçi Kardeş Türküler Topluluğu û birayê Mihemed Şexo Baha Şexo beşdar bûn. Her wiha ji KAYY-DER'ê Koma şanoyê "Evîna Welat" bi navê "Em sond dixwin" mîzansenek pêşkêş kir. Komê bi listika xwe gelekî bal kişand.

Di şahiyê de, di beşa protolokê de van kesan cih girt: "Cigirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Osman Özçelik, Gerîndeyê Giştî yê Ûlkede Gündemê Erdem Önal, Seroka Giştî ya NÇM'ê Nuray Şen, Serokê HADEP'a Stenbolê Mahmut Şakar, Serokê HADEP'a Stenbolê yê berê Hikmet Fidan, Xwediyê Rojnameya Azadiya Welat Cellattin Yöyler, Cigirê Serokê Sinê-Senê Yusuf Çetin, Cigirê Serokê Înstîtûya Kurdî Hasan Kaya, Endamê MYK HADEP'ê Melik Aygün, Rayedarê HADEP'a Meletiyê Süleyman Yücedağ, ji



Yeni-ış Metin Kan û Rayedarê TAYD-DER'ê Yüksel Çimen"

Mirov dikare wekî derkenarekê li vir binivîse. Di şahiyê de nebûna nûner û mesajê Egitim-Senê xaleke seyr û balkêş bû. Dîsa wekî xaleke balkêş, çewsandinên li ser Ûlkede Gündem û Azadiya Welat li Caferaga jî berdewam kirin. Rojnameyên ku ji bo firotinê hatibûn, ji aliyê polîsan ve hatin desteser kirin. Li aliyê din, du xebatkarên şaxa NÇM'ê ya Rihayê hatin binçavkirin.

Di şevê de axaftina yekemîn ji aliyê Serokê HADEP'a Kadiköyê Ali Ekber Oğuz ve hate kirin. Oğuz li ser rewşa dawîn a siyasî radiwestiya û bal kişand

ser meclîsa Tirkîyeyê. Bi dîtina Oğuz meclîsa Tirkîyeyê nikare problemên Tirkîyeyê çareser bike, çareserî girêdayî têkoşîna hêzên demokrat û welatparêz e.

Piştî Alî Ekber Oğuz, xwediyê Rojnameya Azadiya Welat Celalettin Yöyler axivî û spasiyên xwe pêşkêşî sazûmankar û piştgirên şahiyê kirin.

## Xwedîderketina li zimên, xwedîderketina li welat e

Pişt re Gerîndeyî Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan, li ser rola Azadiya Welat û girîngiya zimanê kurdî axaftinek kir. Tan bal kişand ser politikayên dawîn ên dewleta tirk û got ku divê gelê kurd li dijî van politikayan rabe û li çand û zimanê xwe xwedî derkeve.

Serokê HADEP'a Stenbolê yê berê Hikmet Fidan jî di axaftina xwe da qala çewsandinên li ser çand û zimanê kurdî û rola Azadiya Welat kir. Fidan ji hemû kurdan xwest ku li Azadiya Welat xwedî derkevin û got ev ji bo tevahiya kurdan berpîrsiyariyê sereke ye. Hikmet Fidan wiha peyivî: "Mêtinger ji bo ku neteweyan ji holê rakin, pêşî ji zimên dest pê dikin. Lê zimanê kurdî ji bo ku dewlemend e, li ber xwe daye û heya îro hebûna xwe parastîye."

Cigirê Serokê Giştî yê HADEP'ê û Nivîskarê Azadiya Welat Osman Özçelik jî di axaftina xwe ya bi kurdî de li ser diwaroj û raboriya zimanê kurdî se-

kinî. Bi baweriya Osman Özçelik, 'Azadiya Welat neviya rojnameya Kurdistanê ye û zimanê kurdî îro di rêza zimanên sereke de cih digire. Özçelik derketina li zimên, xwedî derketina li welat e. Heke hûn welatê xwe dixwazin, li "Welat" xwedî derkevin."

Di şahiyê de ev slogan hatin avêtin; "Gerîla lédixê, Kurdistanê ava dike; Kurdistan wê ji bo faşîzmê bibe goristan; Roja sosyalîzmê li Kurdistanê hiltê; Bimre dîktatoriya faşîst; Ji bo girtiyana azadî; Li dijî faşîzmê yek kulm, yek bend; Şehîd namirin; Azadiya Welat azadiya ziman e; Azadî ji bo Kurdistanê."

Ji bo piştgiriya şeva Rojnameya Azadiya Welat ji gelek saziyên demokrat û welatparêz mesajên piştgirîyê hatin şandin. Çend kes û saziyên ku mesaj hinartin ev bûn: Anadolu TUHAD-DER, Komîsyona Ciwana ya HADEP'a Ûmraniyeyê, Atılım Gazetesi, KAYY-DER, Serokatiya HADEP'a Ûmraniyeyê, Alternatif Gazetesi, Özgür Gençlik, Ciwanên HADEP'a Kadiköyê, Ciwanên HADEP'a Ûsküdarê, Kovara Stêrka Rizgarî, Komîsyona Ciwanên a HADEP'a Beyoğluyê, Kovara Özgürleşen Yurtsever Gençlik, Komeleya Xebatkarên Avahiyan (İÇD), Seroka ÖDP'ya Kadiköyê Av. Serap Kaya, HADEP'a Eyübê, NÇM'ya İzmîrê, Baska Jinên HADEP'ê, Kovara Jiyana Rewşen û Kovara Özgür Halkê.

NAVENDA NÜÇEYAN

